ARMANC
Xwedî :Yekîtiya Karkerên Demokrat ên Kurdistan
*
Ji Mehê Carekê Dertê
Hejmar : 62
Tîrmeh 1986
Buha : 10 Skr., 3,5 DM

# Armanc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly Kurdish Magazine
Issue by The Democratic Union of Kurdish Workers
Nr.: 62
July 1986
Price: 10 Skr. 3,5 DM

Adress : YKDK, Nordenflychtvagen 20, 112 51 Stockholm, Tel: 08/52 87 56 Adresa têkilî û naman : P.O. BOX 240 12 750 24 Uppsala/SWEDEN Postgiro: 50 37 99 - 9/ISSN 0348-7385

«GAP mezintirîn proja dewra Cumhuriyetê ye»

# Rastiya tal a piştî propagandayên şêrîn!

**Li welatê me yê bindestkirî yê paşdexistî, qismên ku pirtirîn di rewşek dijwar de ne , yek ji wan jî qismê gundiyên bê zevî û belengaz ên Kurdistanê ye. Di dewra Imparatoriya Osmanî de, di riya beg, axa, şêx û xanedanan re sultanên Împaratoriyê, Kurdistan bi xwe ve girêdabûn. Gundiyên bê zevî yê Kurdistanê, wek mal û milkekî bi van xanedan, beg û axayan ve girêdayî bûn, ji alîkî de bac û xerac didan wan, rêncberî û xulamtiya an dikirin, ji alî din de jî di riya dar û dezgên burokrasiya Împaratoriyê bac, serane û xerac didan sultanan , di şerê wanî fetihkarî û dagirkerî de mecbûr diman diçûn şer, bi pênc salan, deh salan ji gundên xwe, mal û zarokên xwe bi dûr diketin, pirê caran jî li çolan dihatin kuştin, venedigeriyan mal.**

**Dema piştî Şerê Cîhanê Împaratoriya Osmanî têkçû, felişî, tevgera Kemalîst ji bo ku nehêle serdestiya Tirkan ji Anadolê rabe Anadol ji hemû milletên din bê malîştin û bi tevayî têkeve bin destê burjuwazîyê Tirk ketin nav tevgerek xurt. Di vê tevgerê de armancek jê jî ew bû ku, Kurdistan ji bin lepên burjuwaziyê Tirk dernekeve û serxwebûna xwe bi dest nexe. Bi vê armancê Kemalîstan êrîşek hov û har birin ser tevgera rizgarîxwaz a milletê Kurd, ji alîkî de bi alîkariya emperyalistên Îngilîz û Fransiz, ji alî din de jî bi alîkaiya hin beg û axayên bêganeperest ên Kurdistanê tevger şikandin, serdestiya xwe di Kurdistana Tirkiyê de bi cîh kirin.**

*Dûmahîk r.7*

## Bi hêviyek teze Bi destpêkek teze

*Xwendevanên hêja,*

*Armanc piştî rawestandinek dirêj,bi hêviyek teze cardin dest bi weşana xwe dike.Salek berê,bi biryara ku Armanc bibe rojnamek seranser kurdî,hatibû rawestandin.*

*Wek hûn jî di vê hejmara di destê xwe de dibînin, destpêka nuh gelek guhartinên naverokî û şiklî jî bi xwe re tîne.Vê gavê Armanc wê dîsa ji mehê carekê,lê bi heşt rûpelên mezin û xwerû(seranser) bi kûrdî derkeve.Armanc êdî ne kovar lê rojnamek seranser bi kurdî ye.*


*Wek xwendevan jî dizanin Armanc berê bi kurdî û tirkî derdiçû.Ya din ji ber ku kovar bû,hidûdek ji naveroka wê re hebû,me rê nedidît cîh bidin gelek buyer û pirsên civakê yên têvel.Lê eşkere ye,ku îro îhtiyaca gelê Kurd û tevgera rizgarîxwaziya Kurdistan ji rojnamek seranser kurdî re heye,ku karibe rûpelên xwe ji cur be cur pirs û pirsgirêkên civakê re veke.*

*Berî her tiştî,miletê Kurd ne ku bes hatiye pelçiqandin,ketiye bin nîrê mêtingehkariyê û ji hemû mafên xwe bêpar maye,her wiha dijminê dagirker dixwaze bi her awayî hebûna wî ji holê jî rake;ziman,çande û dîroka wî wenda bike,wî bi her awayî di parzûnê asîmîlasyonê re dawerivîne,ji rûyê erdê rake.*

*Vê rastiya han baş dixe ber çav ku tevgera rizgarîxwazî ya Kurdistanê,ji her milet û welatekî din pirtir divê xwe têxe têkoşînek pir alî.Em hêz û partiyên şoreşger û welatparêz,kesên xwenda û ronakbîrên milet divê ji yên her miletî bêtir wazîfên piralî yên civakê bidin ser milên xwe.Çiqas têkoşînek siyasî (ji riyên dîplomasî ta bigre ya çekdarî) ji me re divê,jê ne kêmtir jî têkoşînek kulturî ji bo me divê. Divê wek wazîfek girîng û lez em têkevin xebata pêşdebirin,xwerûkirin û xurtkirina zimanê xwe,vejandin û geşkirina hebûnên xwe yên kulturî û ronîkirina dîroka xwe.Heke têkoşîna siyasî skeletê hebûna civaka me ye,kultur jî goşt û xwîna wî skeletî ye.Skeletekî bê xwîn û goşt,hebûnek hişk û mirî ye.Lê yê jîndarî têxe civakê ew xwîn û goşt e. Têkoşîna rizgarîxwazî bi vî awayî diguhere organîzmek jîndar.*

*A tiştê ku rê li ber derketina Armanca li destê we ya bi vê nave-*

*Dûmahîk r.6*




## Pêşmerge pêş de diçin

***Pêşmergên Kurd di şerê dawî de du tugayên Îraqî tevî cebirxanê hêsîr girtin.**
***Pêşveçûna pêşmergan ne ku bes xewa rejimê Îraqê lê ya dîktatorên Tirk jî direvîne.**

Li gor deng û bahsên ku ji bingehên pêşmergan bela dibin, di van mehên dawî de li Kurdistana Îraqê, pêşmerge li hemberî rejimê Îraqî yê dagirker û zordar, bi çalakî pêşde diçin.

Di meha gulanê de, şer di nabêna hêzên pêşmerge yên Kurdistanê û Ordiya rejimê Îraqî de carek din gur bû. Rejimê dagirker qismekî ji leşkerên xwe yê cebha Îran û Îraqê kişand û wan rêkir ser hêzên çekdar yên Kurdistanê.Bi êrîşên nû yên ordiya dagirker, şer li Kurdistanê û bi taybetî li herêma Dihokê fire bû. Di vî şerî de pêşmergên Kurdistan du tugayên leşkerî(yek jê 700, ya din jî 800 leşker) yên rejim tevî çek û cebirxanên wan hêsîr girtin.Ji van tugayan yek, wek ku rojnamên Tirk didin

*Dûmahîk r.7*



# Şairê Kurd Hêmin koç kir.

**Hêmin berî mirina xwe li Kurdistana Îranê Urmiyê bi navê "Surwe" (Sur,Sura Bayê) kovarek edebî derdixist.**

Şairê navdar ê Kurd, Hêmin roja 18 ê Nîsana 1986 a li Kurdistana Îranê li bajarê Urmiyê, xatirê xwe yê dawî ji Kurdan, ji dilsozên xwe xwest û bi temamî serê xwe danî. Mirina şairê mezin, di nav Kurda de bû sebebê xemgîniyek mezin. Bi mirina wî milletê Kurd, edebiyata Kurdî kadirekî pêşketî, şair û nivîskarekî hêja wenda kir. Bi şairtiya xwe ew dengê daxwaz, hevî û hestê milletê Kurd bû.

Hêmin, di bihara 1921 ê de li gundê Laçîn, nêzî Seblaxê (Mehabadê) hatibû dinê. Navî wî yê esasî Seyid Mihemmed Emînê Şêxulislamê Mukrî bû. Xwendin û nivisandinê li Mameş li nik Seîd Nakam hîn bû. Dawiyê çû Seblax ket dibistana dewletê, çar salan li wir xwend. Dawiyê çû Xaneqê (Tekyak) çar salan jî li wir xwend. Di wan deman de şairê Hejar naskir û dostanî pê re danî.

Dewra Xaneqê û hevalên wî

*Dûmahîk r.7*

# Tahir Tanriverdî Şehîd ket



*Tahir Tanriverdî*

Roja 25 ê Nîsanê hevalekî hêja yê Kurdistana Tirkiyê Tahir, bi hinek hevalên xwe re xwest ku ji Kurdistana Suriyê derbasî Kurdistana Tirkiyê bive. Lê di sînor de di nava leşkerê Tirk u welatparêzên ku dixwestin derbas bivin da şer derket. Tahir birîndar bû. Hevalên pêre xwestin ku vegerin û wî xelasbikin, lê birîna Tahir giran bû û gelek xwîn winda kiribû. Di dema vegerê de hevalê hêje can da, şehit ket.

Tahir li gundekî Cizîrê li Kurdistana Tirkiyê hatibû dinyê. Di bin zilma dijmin de mezin bûbû. Ji ber vê yekê jî kolonyalîstên Tirk baş nas dikir.

Tahir di wê baweriyê de bû ku bê têkoşînek giranbiha gelê Kurd serfiraz nabe. Ji bo azadiya gelê Kurd, divê şerê rêxistinî bê xurtkirin. Li dijî hêzên dijmin ê yekbûyî divê ku em welatparêzên Kurd jî hêzên xwe di eniyekî netewî û demokratî de bikin yek. Riya belavkirina hêzên kolonyalîst di yekbûna me welatparêzan re derbas dibe. Dara azadiyê bi xwîna şehîdan hêşîn dibe.

Ji ber van xebatên hêja heval Tahir wê neyê ji bîr kirin, ewê her dem di bîra me da be û di têkoşîna gelê Kurd de bê bi bîranîn.

RAMANÊN RAMANWERAN

# Îro partiyên wan diherifin Sibê dor tê ser parlamentoyê

*M.CIWAN*

Generalên Tirk, gava di sala 1983-an de dest bi demagojiya vegera demokrasiyê kirin,bi fêlbazî û dek û dolaban ji xwe re hin partî damezirandin.Hin ji wan ''çep'' û hin ji wan jî rast xuya dikirin.Bi vî awayî generalan hesab dikirin,ku wê bi çêkirina helbijartin û danîna parlamentok destik hem karibin raya giştî ya cîhanî û welat bixapînin,rexne û êrîşên wan piçekî ji ser xwe bidin alî û hem jî di riya van partiyan re civakê di bin kontrola xwe de bihêlin.Wan hesab dikir,ku çi bêjin wê xelk wek wan bike.Loma jî berî helbijartinên 1983-an dabûn xuyakirin ku dixwazin kîjan partî bila here ser hukum û kîjan jî bi navê çepîtî û rastiyê li parlamentoyê di ''mixalefet''ê de bimînin.

Lê gava helbijartin çêbûn,netîce wek generalan derneket. A ku generalan dixwestin pirtirîn ray bistîne û were ser hukum li dawîya gişa ma û ji hemûyan hindiktir ray girt.Ev şirmaqa ewil bû,ku miletê li rûyê generalan xist.

Di helbijartinên 1983-an de generalan bes rê dabûn wan partiyên ku bi destê wan hatibûn damezirandin.Partiyên din her çiqas yên burjuwazî bûn jî,rê nedan wan ku beşdarî helbijartinê bibin.

Piştî helbijartinan,bi gur û geşbûna nerazîtiya xelkê li hember polîtîka aborî ya generalan,zordarî û terora wan û geşbûna kar û barê muxalefeta dijî dîktatoriyê,kontrola civakê hê pirtir ji destê generalan derket.Partiyên burjuvazî yên dijî dîktatoriyê,ne bi xurtî û bi mêranî be jî hêdî hêdî dengê xwe bilind kirin.

Hat qonaxek wilo ku ji xeynî partiya ser hukum a Turgut Ozalê Serekwezîr,kesî nema guh da partiyên nav parlamentoyê.Ji çavê xelkê bi temamî ketin,piştgirî û sîmpatiya ku ji wan re hebû jî çû.Di yekemîn kongra partiya ku bi navê çepîtiyê generalan damezirandibûn de,partî ji destê dar û destikên generalan derket.Vê partiya ku navê wê HP(Partiya Gel) bû,piştî kongrê çû bi partiya SODEP(Sosyal Demokrat)a Erdal Înonu re bû yek.

Partiya MDP(Partiya Demokrasiya Nasyonalîst) ku generalan,di serokatiya generalekî kevnekot de damezirandibûn û xwestibûn were ser hukum,di kongra xwe ya yekem de serokê xwe û karbidestên xwe yên ji çavketî guhart,hin kesên sîvîl anî şûna wan. Bi vê,generalan dixwestin prestîjek nuh bidin partiyê û wê li ber çavê xelkê şêrîn bikin.Le vê yekê jî fêde nekir.Ji kongrê vir de rewşa partiyê xerabtir bû.Wek laşekî nesax ket taya mirinê.Dawiya dawiyê,endamên partiyê di meha borî de kongrek nuh civandin û partî fesih kirin,''fatîhak'' li ser rûhê wê xwendin.

Piştî belabûna MDPê,parlamenterên endamê vê partiyê bi serê xwe man.Hinek ji wan ji xwe re grubek çêkirin. Hin ji wan çûn ketin partiya Demîrel a nuh;DYPê.Hinek çûn partiya Turgut Ozal û hinek jî bi serê xwe man.Lê yên ku bi her awayî bi generalan ve girêdayî bûn bi hêviya xapandinek nuh,di serokatiya sermiyandarê mezin Mehmet Yazar de partiyek nuh bi navê HDP(Hur Demokrat Parti) ava kirin.Di riya vê partiyê re general dixwazin ku kontrola xwe ya ser parlamentoya dûvik bidomînin,nehêlin tu biryar û qanûn ên ew naxwazin ji parlamentoyê derbasbin.

Di esasê xwe de,îro partiya Turgut Ozal,bi hêza xwe û bi siyaseta xwe pirtirîn bi kêrî generalan tê.Lê general ji alîkî de naxwazin,ku hukmet di helbijartinên pêş de têkeve destê sosyal demokratan û ji alî din jî naxwaze,ku Demîrel xurt bibe.Lewra heta niha generalan xwestin,ku bi Demîrel re li hev bikin,partiya wan û a Demîrel bibe yek lê Demîrel vê yeke qebûl nekir.

Herçî Demîrel ne evîndarê demokrasiyê û ne jî aşiqê çavê xelkê ye.Lê ew çima ku general heta niha bû du car wî ji ser hukum dixînin,gelekî li dijî wan e.Li gor wî ew çêtir dikare mafên sermiyandaran biparêze û divê esker her ji deh salan carekê pozê xwe nexin nav karê wî.Loma jî dixwaze tola(heyfa) xwe ji wan hilîne.

Bi vê rewşa wî ya han general naxwazin,ku partiya wî xurt bibe.Ger wî zeîf bikin wê çêtir karibin mecbûrî xwe bikin.Loma jî di basikê rast de partiyek nuh danîne.

Lê,rûdana buyerên civakî û siyasî yên heta niha baş didin xuyakirin ku ne hêsa ye general hema çawa bixwazin civakê ber bi daxwazên xwe de bikşînin.Li alî din dijitî û dubendî-sêbendiya nava burjuvazî jî rê dide van buyeran.

Helbet divê hêzên şoreşger û demokrat yên gelê Tirkiyê û Kurdistanê bi her awayî çav li van dubendiyên nav burjuvazî negrin.Ger di têkoşîna siyasî de meriv jîr,zana û hişyar be,meriv kare fêdê ji dubendiya nava dijmin bigre.Him gav bi gav pûçbûna karûbarê generalan û him jî dubendî û dijitiyên nav sermiyandaran,riya têkoşîna me hêsatir dikin.Lê divê em siyaseta xwe li ser van ava nekin û bi her awayî xwe nespêrin hêviya dubendiya nav wan.

Di esasî de,divê em berê xwe bidin riya xelasiya rastîn û baweriya xwe bidin tekoşîna hêza gelan.Ger têkoşîna gelêrî li ser riyek rast, bi hişyarbûnek zanistî gur û geş bibe wê gavê meriv dikare çêtir fêdê ji dubendiyên dijmin bibîne.Ger têkoşîna esasî ne li meydanê be û alternatîfek şoreşgerî di nav gel de rû nedabe,wê gavê ne ku dubendî,sermiyandar ji hev de bikevin jî mirov nikare tu fêdê jê bigre.Lê ku tevgera şoreşgeriya Kurdistanê û Tirkiyê xurt be,hêzên şoreşger û welatparêz xwe bikin yek,îro çawa partiyên generalan diherifin,sibê wê parlamentoya wan,dûr re jî wê rejîmê wan ê faşîst biherife.

●

*ARMANC LI HÊVIYA NÛÇE, NAME Û RESMÊN WE YE.*

*JI BÎR NEKIN KU BI ALÎKARÎ Û PIŞTGIRIYA WE ARMANC DI KARE HÊ XURTTIR BIBE:*

**ARMANC**




# JI XWENDEVANAN RE

**Xwendevanên hêja, wek hûn jî dibînin ev hejmara Armancê hemû bi Kurdî ye. Me, berî vîya bi salekê, di meha Nisana 1985 a de Armanc dabû sekinandin ji bo ku wê bi vî rengî derxînin. Û îro hinekî bi derengî be jî lê bi wê şikil û naveroka ku me dixwest em Armancê ji nû ve dighînin destên we. Bê guman li gor vî şiklê nuh wê hin guherandinên teknîkî jî-wek raxistina rûpelan- çê bibûya. Ji van guherandinên me yek jî quncikê namên xwendevana ye. Me xwest ku ev quncik bes yê xwendevanan be. Hûn dikarin li ser şikil û naveroka Armancê pêşniyar û rexneyên xwe, daxwaz û her babet nûçeyan bişînin, emê jî van namên we di vî quncikî de biweşînin. Nûçeyên hûn dişînin bê guman dema bi Kurdî bin wê gelekî baştir be, lê ne bi Kurdî bin jî tişt nabe, em dikarin wan wergerînin.**

**Bê şik em dixwazin ku hîn bêtir cî bidin deng û bahsên ji Kurdistanê û nûçeyên li ser Kurdan. Lê belê di vî warî de jî hewcedariyek me ya mezin ji xwendevanên me heye. Dema hûn jî alîkariya me bikin, emê karibin ji her çar perçên Kurdistanê nûçeyan bigihînin we.**

**Di nûçeyan de tiştê ku lê miqate bê kirin: Em bibêjin di nûçeyekê de qala meşekê tê kirin, dibê, tarîx, cîh û armanca meşê, navê hêz(ên) ku meş amede kirine û ger bi texmînî be jî hejmara kesên ku tevî meşê bû ne bê diyar kirin. Û bê guman li gel van jî, ger îmkan hebe rismek bê şandin gelek baştir dibe.**

**Me bi vê hejmarê vatiniyek anî cîh û gavek avêt, lê, domandina vê vatiniyê û derxistina rojnamek gelek dewlemend bi piştgirî û alîkariya we mimkûn e. Dema hûn bi rexneyên xwe kêmasiyên me nebêjin, bi pêşniyar, nivîs û nûçeyên xwe me xurt nekin, wê demê emê jî nikaribin rojnamek gelek dewlemend û bê kêmasî derxînin. Dema ji her alî de nûçe, pêşniyar, rexne, nivîs û lêkolîn ji me re werin, emê jî karibin Armancek hîn baştir û hîn dewlemendtir bighînin destê we xwendevanan.**

**Me gotibû ku wê ev quncik, quncikê namên we be. Lê, yekcarnan jî wê hin gotin ya jî daxwazên me jî, ji we hebin, wê demê emê wan jî di vî quncikî de biweşînin. Bi vî hawî, wê ev quncik di navbera me û we xwendevanan de bibe pirek danûsitendinê. De werin em vê pirê bi hevre xurt bikin. Ji nuha de em li hêviya her babet nivîsar, lêkolîn û nûçeyên we ne.**

**Bimînin di xweşiyê de!**

**Nama Armancê**

## Stiriyên me

***Bavê Nazê***

### KURDÊN ME YÊN SWÊD

**Dema min di unîversîtê de dixwend, li ser xwendevanên Ereb û Vîetnamiyan wiha digotin: ''Heger piştî nîvê şevê di du odan de ruhnî hebe, mana xwe xwenedvanên Vîetnamî dixwînin, yan jî yên Ereb çayê û çixaran vedixwin û bi siyasetê dipeyivin...''**

**Lê ku li Stockholmê, piştî nîvê şevê çirên du odan pêketîbin? Bê guman di her du odan de Kurdên me çixaran dikşînin û dilê xwe li ser Kurdistanê diêşînin. Heger em nebêjin porê xwe dikşînin...**

**Piştî şevbêrkek wiha giran Kurdê me ji xew radibe, çaxê firavînê ye. Westiyaye hîn çavên xwe ji xew venekiriye, dest dipelîne li çixarekê. Pêre-pêre çixarê pêdixe û roja wî ya ''dijwar'' destpêdike. Di bin destên wî de belengaza aperata têlefonê dike nîr-nîr, care-car... Dike hewar û lanetê li roja, ku kete destên ''xwediyê'' nuh tîne.**

**Tevî ku têlefon disincire, her û her Kurdê me dipeyive:**

- **Elo beyanî baş (tevî ku saet li dora 14.OO ye).**
- **Beyanî baş (deng ji aliyê din ve tê).**
- **Bi buhire. Xuya ye min te ji xew rakir.**
- **Na.. na.. istexfirillah !**
- **Te çi deng û bas bihîstiye?**
- **Dibêjin leşkerên Romê ketine Kurdistana başûr.**
- **Mi jî ev bihîstiye.**
- **Ji xeynî van tu exbarên din li cem min nîne.**

**Bîstekê deng dibile, dûre yekî ji wan dibêje:**

- **Ma îro em kengî hev bibînin ?**
- **De were emê piştî saetekê li qehwê hev du bibînin.**
- **Xwa hafiz. Zor sipas ji bo têlefonê.**

●

### SPORT EXLAQ E

Lîstikvanên futbolê yên taximê Kurdistan,di lîstika xwe de ne kêmî hevalên xwe ne.Ew jî fêrî teknîka serdemî bûne û karin biserkevin.Lê diyar e wan ji bîr kiriye,ku sport ne tenê hostebûn e di lîstikê de...Sport disiplîn û exlaq e jî.Mixabin hinek ji lîstikvanên taximê ne tenê bêdisiplîn in,lê heya ji exlaqê sporê jî bêpar in.

Berî çendakî wan bi her hawayî bi lîstika xwe zora xortên Afrîkayî birin ! Ew ji wan siviktir û teknîktir bûn. Loma jî 3-0 biserketin.

Lê di nav lîstikê dê xortên me bi disiplîn û exlaqê xwe qasî bejna xwe ji wan nizimtir bûn.Xuya bû,ku nexweşiyên Kurda ne tenê di warê siyasî,her wiha di warê civakî û sportê de ye jî.

Di tayma pêşî de xortên me bi exlaqê xwe kartek zer qezenc kirin.Di vê navê re kapîtan,bê îzna hakem bêrê xwe da hostê taximê,xwest gomlekê xwe bavêje û ji lîstikê derkeve.

Min bixwe heya roja îro di futbolê de tiştekî wiha nedîtiye! Werin vê ecêbê ku kapîtanê taximê ji temiya hostê xwe dixeyide û dixwae ji lîstikê derkeve.Heke kapîtan wiha be,gelo wê yên din çawa bin!

Bêexlaqiya din ya ku min di lîstika xortên me de dît,ew bû ku gava lîstikvanekî ji yên me qertek zer kezenckir,ji şûna bi dil paqijî efûyê bixwaze,rapelikî belengazê lîstikvanê taximê din.Dema hostê taximê xwest wî bi yekî din biguhere,deng nebir xwe her bi ya xwe kir.

Paşî ku min disîplînek wiha di hundurê taximê de dît,min got;''Xwedê me ji ya mezintir bisitirîne!'' Lê belê Xwedê me nesitirandin û kapîtanê me çend kulmik bi helalî û zelalî ji lîstikvanekî taximê hember xwar.Ezbenî hîn ji kevn de gotine:Herkes kurê bavê xwe ye;çi ji xatûnê û çi ji cêriyê be.Lê kapîtan peyva bav û kalan ji bîr kiribû,xortê hember biçûk dît,û pêş hewqas xelkê xwe radikişandê.Helbet kapîtanê me ji karta zer li pêşberî xwe dît.Bi ya min divê wî ji hakem karta sor û ji hostê taximê qewirandina ji taximê ya heya heya bistandana.

Bi kurtî min ev tiştên han dîtin.Baweriya min ew e,ku lîstikvanên taximê Kurdistanê divê li prêza xwe binêrin û lîstikên xwe bi vî rengî nedomînin.Divê rişmên lîstikvanên şemûs bên kişandin,bên gemkirin.Bixwe tunebûna taximekî wiha ji hebûnê çêtir e.Lewra çi lîstika ku ew bilîzin,wê li pey xwe lanetê ji Kurda re bînin.Gelo heqê wan heye navê Kurdan xerabikin.

### *Kurdim Emin*

*Ger çî tûşî rence royî û hesret û derdim emin*
*Qet le des em çerxe siple nabezim merdim emin.*
*Aşiqî çawî kejal û gerdinî pir xal nîm*
*Aşiqî kêw û telan û benden û berdim emin.*
*Ger le birsan û le ber bê bergî îmro req helêm*
*Nokerî bêgane nakem ta le ser herdim emin*
*Min le zincîr û tenaf û dar û bend bakim niye.*
*Let letim ken, bim kujin, hêşta delêm kurdim emin.*

***Hêmin***

# Rejîma nîjadperest a Afrîka Başûr êrîşî Zambiya, Zîmbabwe û Botswana kir.

**Serekê dewleta Zambiya, Keneth Kaunda, di axaftina xwe de got, ku ev êrîş dişibe êrîşa Emerîka Yekbûyî ku 15 yê meha Nisanê li dij Lîbyayê pêkanî.,**

Piraniya endamên Netewên Yekbûyî vê êrîşê mahkum kirin û piştgiriya xwe ji bo Zambiya, Zimbabwe û Botswana nîşan dan.

Li gor berpirsiyarên leşkerî yên Afrîka Başûr, armanca vê êrîşê ji holêrakirina meqerên ANC (Konseya Netewî ya Afrîka) yên li Zambiya, Zimbabwe û Botswana bû. Her çiqas rejîma nijadperest a Afrîka Başûr di beyana xwe ya fermî de serfiraziya vê êrîşê beyan kir jî dawî eşkere bû, ku di vê êrîşê de zarok, jin û pîr hatine kuştin û birîndar kirin.

Serokwezîrê Zimbabwe Robert Mugabe, di beyana xwe de got, ku alîkariya ku ANC ê re tê kirin dê dom bike û Afrîka Başûr bi van êrîşên terorîstî nikare me ji riya me vegerîne.


Xuya ye, ku rejîma nijadperest a Afrîka Başûr ketiye tirsê. Di hundurê Afrîka Başûr têkoşîna ANC her dom dike. Roj tune ku mîtîng û meş, karberdan û hin tevgerên din neyên pêkanîn. Polîsên dewleta nijadperest bi hovîtî êrîş dibin ser reşikan, wan gulebaran dikin. Roj tune, reşik neyên kuştin.

Têkoşîna li hundurê Afrîka Başûr ji her alî ve gur dibe. Karker, xwendevan, jin û keşeyên reşik û spî bi hevre têdikoşin.

Rejîma nijadperest ji ber hovîtiya xwe û terora ku bi rê dixe her roj qelstir dibe û tenê dimîne.

Rêxistina Yekîtiya Afrîkayê gazî hemû dewletên dinê kir, ku hemû bi hevre Afrîka Başûr mehkûm bikin û wê tenê bihêlin. Wisa xuya ye ku ev gazî ciyê xwe digre û Afrîka Başûr roj bi roj dikeve tenêbûnê.

Serekê dewleta nijadperest a Afrîka Başûr Botha, di beyana xwe de êrîşa xwe û êrîşa Emerîka ku li dij Lîbyayê kir, wekhev nîşan da. Xuya ye şagirt li pêy mamostê xwe diçe.




## 18 MILYON CIWAN BÊ KAR IN

Îro di welatên OECD de hejmara ciwanên bê kar û yên ji xwendinê bêpar, nêzî 18 mîlyon e.

Di 10 welatên AET-yê de ji yên bê kar 12,5 mîlyon kes ên ciwan in. Li Awrûpa Rojava %11,5 bêkarî heye. Ev reqem ji bo ciwanî du qat e.

Di sala 1984-an de li Amerîka Yekbûyî hejmara ciwanên bê kar %39,1, li Ingilterê %25,7, li Fransayê %42,2 û li Îtalyayê, Yewnanîstanê û Portekîzê zêdeyî %60 bû.

Lê belê ev reqemên resmî tenê perçekî rastiyê ye. Di van reqeman de, ciwanên ku dibistanê xilas kirine, ciwanên ku ji bo demek kurt li ciyekî wek şagirt hatine bi cîkirin û piştî şagirtiyê kar bi dest naxin, ne hatine hesab kirin.

## Di Civaka Sovyetê de Jin

Di van salên dawî de, hejmara jinên ku bi lêkolîn û bi ilm mijûl dibin sê qat zêde bû.

Kesên ku di xebata ilmî de ne %40 ji wan jin in.

Lêkolînên sosyolojîk ku van salên dawî li Yekîtiya Sovyetê hatine kirin, nîşan didin ku jin naxwazin jiyana xwe tenê bi malbatên xwe re derbas bikin. Ji deh jinan heft jin ji pirsa ''Eger maeşê mêrê te qasî meaşê te zêde bibe tu ê dev ji karê xwe berdî '' re bersiva ''na'' dan. Sedema vê pirsê daxwaza kûrkirina zanistî û prestîja dê li hember zarokan bû.

Ji zêdeyî nîv milyon jin îro yan serekên fabrîka û şîrketan an jî şefên karûbarê avahiyê ne.

Ji zêdeyî 26 000 jin şîrketên kiştû kal yên mezin îdare dikin.

Peymana Netewên Yekbûyî dixwaze, ku jin di hemû beşên admînîstrasyonê û di birêvebirina dewletê de cîh bistînin. Niha piştî helbijartina 1984-an 492 jin li parlamentoya Yekîtiya Sovyetê cîh girtin û ev hejmar ji 1/3-ê parlamentoya Sovyetê ye. Di Sovyetên heremî de ku xelk xwe bi xwe îdare dikin, hejmara jinan 1 146 000 e. Ev jî %50,1 e.

Ji zarokên piçûk %70 diçin zarokxanan. Dê û bav ji bo zarokxanan tenê 1/4-ê mesrefê didin.

Mehaniya jin û mêran ji yek karî wekhev e. Ew jinên ku dixwazin kar bikin, ji wan re kar hene. Ji %50,1-ê karkeran jin in.

Li Yekîtiya Sovyetê sîstemên hîndekarî û tenduristî ji jinan pêk hatine. Ji vê yekê jî hin tesîrên negatîf peyda bûne. Dema mirov dixwaze hejmara mêran di kar û barên hîndekarî û tenduristiyê de zêde bike, divê mirov hejmara jinan kêm bike û ev jî vatiniyeke têkilhev e.

Di navbera sala 1975 û 1985-an de hejmara jinan di dibistanên navîn û bilind de %37 zêde bû. Îro di van beşan de hejmara jin û mêran wekhev e.

## UNÎCEF : 3O MILYON ZAROK ALÎKARÎ STENDIN

Ji sala 1946-an û vir de UNICEF-ê alîkariya 30 mîlyon zarok kiriye. UNICEF van salên dawî, girâniya alîkariya xwe dide welatên paşdemayî.

UNICEF tenê di sala 1984-an de alîkariya 112 welatên paşdemayî kir, ku di van welatan de 870 mîlyon zarokên li bin 15 salî hene.

Lê belê dîsa jî di van welatên paşdemayî de rojê 40.000 zarok dimrin. Li gor lêkolînên UNICEF-ê sedema taybetî ya mirina zarokên biçûk, kêmbûn û windabûna avê ya ji laşê mirovîn e.

Helkirina hewcedariya avê, şekir û xwê dê salê 5 mîlyon zarok ji mirinê xelas bikrana.

UNICEF di sala 1985-an de, li 26 welatên Afrîkî dest bi kampanyake aşîbûnê(vaksînasyonê) kir.

## MIREKA CIHANÊ

## BUYERA ÇERNOBÎL Û ANTÎ-SOVYETÎZM

***H.MIZGÎN***

Wek tê zanîn sentrala atomî ya Çernobîlê teqiya. Li gor raporên dawî ku ji alî televîzyona Sovyetê hatin xwendin hêjmara kesên mirî ji 2O an buhuriye.

Bajarê Çernobil bi temamî hate valakirin. Nuha jî ji bo ku serê sentralê bête girtin, xebatek tekûz tê kirin. Li gor pisporan talûka bûyereke din pir hindik e.

Radyoaktiv ku ji vê sentralê derket li ber bayê bela bû û çû gihîşt rojhilat û başûrê Ewrûpa.

Armanca me ne ew e, ku bi dûr û dirêjî em qala vê bûyerê bikin. Wisa xuya ye, ku ji dêvla ku kevneperestan ji vê bûyerê ders derxista dest bi propoganda dijî Sovyetê kirin. Propaganda emperyalîstan wisa bi ''hosteti'' hat bi rêxistin ku mirov hew diwêrin hêşînayî bixwin. Welatên YEA (Yekîtiya Ewrûpa ya Aborî) vê bûyerê bahane kirin û îtxalata hêşînayî û fêkiyan ji welatên sosyalîst rawestandin. Ji vê yekê monopolên Ewrûpa bi milyaran kar kirin. Ji ber ku buhayê fêkî û hêşînayî %5O-7O ê zêde bûn.

Dezgên ragihandinî yên welatên Ewrûpa ji dêvla ku ber bi gaziya Çernobîliyan herin bûyerê li gor menfaeta karbidestên xwe bikaranîn û propaganda antî-Sovyetîzmê kirin. Ji bûyerê hukumeta Sovyet berpirsiyar hat nîşandan û di şexsê hukumeta Sovyetê de antî-Sovyetîzm û antî-komunîzm geşkirin.

Rojnamevanekî Îtalyanî vê bûyerê bi hawakî din bikaranî, rojnamevan Thomas Garîno filmekî xwe wek filmê agirê Çernohbîlê şani da û vî filmî firot şîrketên televîzyonê yên ABC û NBC. Her du şîrket jî mezintirîn şîrketên Emerîka Yekbûyî ne.

Li bajarê Trieste, li başûrê Îtalyayê agir bi fabrîka çîmentoyê ketibû. Thomas Garîno jî vî agirî xist filim. Xwe xist dewsa turîstekî Yugoslavî û telefonî her du şîrketên Emerîkanî kir. Bi 2O.OOO dolaran filmê xwe firote wan. Lê dema ev filim di televîzyona Îtalyayê RAÎ-TV de hat weşandin rastî derket holê. Kesên ji Triesta rabûn telefonî RAÎ-TV kirin û bi vî awayî sextekariyê derxistin holê.

Filim cardin hat weşandin lê bi navê ''Sextekariya Sedsala Me Triestê-ne Çernobîl''. Piştî vê bûyerê rojnamevan Thomas Garîno hat girtin.

## Dewletên emperyalîst ji nû ve dixwazin plana Marshal bikar bînin

Ji erzaniya petrolê kara dewletên wek Emerîka Yekbûyî, Japonya, Fransa, Brîtaniya, Kanada, Almanya Federal û Îtalya zêde bû.

Ev dewletên han dixwazin bi van peran hukumetên hin rejîmên kevneperest ên Rojhilata Navîn bidomînin, imrê wan direj bikin.

Heft dewletên emperyalîst di civîna xwe ya Japonyayê ya di navbera 4 û 5 ê Gulanê de biryar dan, ku perên ku jê erzaniya petrolê ketiye kîsên wan bînin ba hev û van peran ji bo menfaeta xwe bikarbînin.

Di hîmê vê planê de ne tenê alîkariya hin rejîmên kevneperest heye. Ew bi vê planê dixwazin hin hukumetên pêşverû û demokrat yên li Rojhilata Navîn jî ji holê rakin.

## Daxwaza Kongra Emerîka Yekbûyî di civîna NATO'yê de qebûl bû.

Roja 22 ê Gulanê civîna wezîrên bergirî yên endamên NATOyê pêkhat. Di vê civînê de pişniyara Emerîka Yekbûyî li ser çêkirina bombeyên kimyewî bi piranî hate qebûlkirin.

Di raberzîna li ser vê babetê de hin endamên NATOyê-Hollanda, Danîmarka, Yewnanîstan, Norweç, Izlanda û Luksemburg- li dij pêşniyarê derketin. Ev şeş endamên NATO, li dij bicîkirina van bombeyên kimyewî jî derketin û beyan kirin, ku ew dê bombeyên kimyewî di welatên xwe de bi cî nekin.

Ev biryara NATO, mesuliyetek giran dixe ser milê NATO. Ji ber ku bi çêkirina bombeyên kimyewî rewşa danûstandina ji çekbûnê dixe merheleke pir bi talûke. Ev biryar dê tesîrekî pir kûr li civîna Cenevreyê û civînên din ku li ser aşîtiya dinê tên kirin, bike.

Di gotareke rojnama Îzwestiya ya 21 ê Gulanê de, nivîskar O. Molov li ser biryara NATOyê wiha dibêje, ''Planên Waşîngtonê ev in, ku bi çêkirin û bicîkirina bombeyên kimyewî li Ewrûpa ku talûka li hevketina leşkerî pir mezin e, Ewrûpayê bike meydana şerê kimyewî. Di şerekî wiha de yên ku zerar bibînin kesên sivîl in.


Li gor texmîna pisporan, di şerekî wiha de, dê ji leşkeran 2O-3O car zêdetir kesên sivîl bêne kuştin. Bi vî awayî jî Emerîka Yekbûyî dixwaze Ewrûpayê bike ''rehîna du alî'', hem ji bo bombeyên atomî û hem jî ji bo bombeyên kimyewî.

## Eden Pastora:

### "EM NAXWAZIN BIBIN DESTIKÊ EMERÎKA YEKBÛYÎ"

Piştî Şoreşa Nîkaraguayê,wek tê zanîn Sandînîst biserketin.Dîktatoriya xwînmij ya Somoza hilweşiya.Amerîka Yekbûyî bi peran rêxistinên dijî Şoreşa Nîkaraguayê saz kir.Ji van rêxistinan re di hundirê Hondurasê de meqer(kamp) ava kir.

Yek ji rêxistinên ku li dij Sandînîstan serî hilda,wan rojên buhurî dev ji şerê dijî Sandînîstan berda.Serekê rêxistinê Eden Pastora di civîna ku ji bo rojnamevanan pêkanîbû,wiha got;''Em naxwazin bibin destikê Amerîka Yekbûyî ku dixwaze Hukûmeta Sandînîstan ji holê rake.Em naxwazin wek leşkerê Amerîka Yekbûyî şer bikin.Şerê me li dij hukûmeteke çep î tûj û millî bû''.




Eden Pastora bi navê ''Comandante 0''(Komutanê 0) jî tê naskirin.Rêxistina wî ARDE(Tevgera Demokratîk a Şoreşger) rêxistineke sosyal demokrat e.Alîkarî ji sosyal demokratên Amerîka Latînî û ji SPDya Almanya Federal distand.

Eden Pastora bi 400 hevalên xwe çû îltîcayê Kosta Rîka kir.Di beyana xwe de got;''Em têgihiştin,ku di van şertan de em nikarin serfiraziyeke leşkerî bi dest xin''.



DÎROK û EM

# Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

**KARLANÊ ÇAÇANÎ**

**NOTEK : Di vî rûpelê Armancê de hûn ê ji niha pê ve kitêba Karlênê Çaçanî, "Pismamtiya Cimeta Ermeniya û Kurda" bibînin. Me ew ji tîpên Kirîlî wergerand tîpên Latînî û piçekî jî xwerû kir.**

**ARMANC**

## PÊŞGOTIN

Pirsa hevkariya civakan,xelekeke teoriya Marksîzm-Lenînîzmê ya girîng hesab dibe.Vê yekê paşî Şoreşa Oktobrê ya Sosyalîstî ya Mezin naverokeke teze stend,çimkî ji bona her milet û civatekê mecal hatin sazkirinê,ku ekonomî,medeniyet edebiyata xwe bi azayî pêş de bibe,peywendiyê xwe yê dostanî û înternasyonalîzmê kûrtir û tekûztir bike.V.Î.Lenîn dinivîse:"Em tifaqa mileta ya rizadilî dixwazin,tifaqeke wisa ku zordestî ji aliyê miletekê ve li ser miletên mayîn neyê kirin,tifaqeke wisa ku bi temamî hîmdayî be li ser ewlekariyê,li ser fêmdariya biratiyê ya sade,bi carekê ve li ser rizadiliyê hîmbûyî be".(1)

Partiya Komunîst,di karê avakirina komunîzmê de hemû wesiyetên ku Lenînê mezin emir kiribûn bi cîh tîne,guhdarîke mezin dide ser pirsa miletiyê.Partiya me bi wê prensîba dostanî û înternayonalîzmê ve pêş de diçe,ji bo ku li cem me nasyonalîzm û şovenîzm pêş de neyê,çimkî her tenê di qewlê dostaniya civaka ya tekûz de em dikarin bi serfirazî programa komunîzmê ya mezin biserxin.

Pirsa hevkariya civaka Ermeniya û Kurda jî pirseke zanistî û siyasî ya girîng hesab dibe.(2) Dostaniya van herdu civakan ji qirna tê û li ser hoyên sosyal-ekonomîkiyê,qewimandinên dîrokî yên girîng hatiye avakirin,bi şerkariya wan mêrxasên pak ve ew pêş de çûye û tekûz bûye.(3) Vê dostaniyê di şerkariya li hemberî hukumeta Tirkiyê de qal bûye.Her çiqas zêrandinên hukumeta Tirkiyê li ser civaka Ermeniya û Kurda gumreh bûne,hewqas jî hevkariya van herdu civakan tekûz bûye.

Pirsa şerkariya civaka Ermeniya û Kurda,bi tevayî li hemberî dagirkeran,gelek caran ji aliyê nunerê ronakbîr ên civaka Ermeniya û Kurda yên pêş ve hatiye pêşda kişandin,rê û mecal hatine sazkirin,ji bo ew şerkarî tekûztir û zortir bibe.

Ev peywendî û bi taybetî jî ya ji qirnê 18-a destpêkirî,firetir û tekûztir dibe.Eşkere ye,ku pîskoposê dera Mûşê Hovnan tevî mimesilekî ronakbîrê civaka Ermeniya yê pêşketî Hovsep Emîn di salên 60-70-yî yên qirnê 18-a de konkrêt dest bi karkirin,mecal dan sazkirinê ji bo tekûzkirina şerkariya van herdu civakan a pêkve.Dawiyê,herwekî li Ermenîstana Roava,li ya Rohilat,ji bal ronakbîrên Ermeniya yên pêşketî,herwekî Xirîmyan Hayrîk,Gr.Arsrûnî, Çilînkeryan,Mamûryan H.Svaçiyan,A.Çopanîan,Tîgraniyan,Raffi,Abovyan û gelekên mayîn pirs pêşdê dihatin kişandinê ji bo her awayî dostaniya civaka Ermeniya û Kurda tekûztir bibe,ku azabûna wan ji zulmkariya Tirkiyê di nava şerkariya wan a tevayî de ne.

Her ûsa,gelek rewşenbîr û serekên serîhildanên Kurda jî li ser wê fikrê bûne,wan di jiyanê de pirsa tekûzkirina dostaniya civaka Ermeniya û Kurda bi xebata xwe ve gelek caran biserxistine.Îro,gava em dîroka dostaniya civakêd Ermeniya û Kurdan dinivîsin,nabe ku navê Ezdanşîr û Şêx Ubeydule,Evdirezaq û Evdilrehman Bedirxan,Şêx Îsmaîl,Seyid Îbrahîm,Seyid Riza di bîr neynin.

Dostaniya van herdu civakan kevnare(qedîmî) piştî Şoreşa Sosyalîstî ya Mezin,naverokeke teze stend.Bi saya siyaseta Lenînî ya miletiyê ya Partiya Komunîst dostaniya van herdu civakan tekûztir bû.Ji bo halxweşkirin û pêşveçûna jiyana Kurda ya sosyal-ekonomîkî-siyasî û medeniyetê hemû mecal hatin sazkirinê,di Ermenîstana Sovyetiyê de roj bi roj jiyana civaka Kurda gulvedide û pêşde diçe.

Çimkî lênihêrandina dostaniya civakan,di roja me de bûye pirseke girîng,ji bo wê jî me nêt danî pêşiya xwe,ku dîroka dostaniya civaka Ermeniya û Kurda ya bi qirna,li ser hîmê îdeolojiya Marksîzm-Lenînzmê biivîsin.Helbet em li ser wê fikrê nînin,ku bêjin me karibiye hemû pirsê bi dostaniya civaka Ermeniya û Kurda ve girêdayî ye,safî bikin,em li gorî qeweta xwe wan pirsan bilindkin.

Heta niha,xebateke tevayî di derheq vê pirsa zanistî û siyasî ya girîng de tunebû.Her tenê di hinek xebatan de em rastî çend pirsan tên,ewên ku bi dostaniya van herdu civakan ve girêdayî ne.Em dixwazin hem xût li ser van xebatan bisekinin.

Di vê beşê de xebateke pir bi rûmet ya Hukob Şahbazyan e,ku "Tarixa Kurda û Ermeniya" ye.Li wir hinek şaşî hene û bi konsepsiya xwe ve ne rast e.Lê di kitêbê de em rastî gelek pirsên girîng tên: Wan pirsên ku dostaniya civaka Kurda û Ermeniya ya kevnare,şerkariya wan a pêkve li hember dagirkerên Tirkiyê didin eşkere kirin.Di vê xebatê de her ûsa derheq tevgirêdana edebiyat û medeniyeta van herdu civakan de jî hinek tesbît hene.(4)

Di derheq pirsa em lê dinêrin de,her ûsa me hinek qeneatên bikêr ji xebata E.Frangiyan a "Antrpatakan"ê hildaye.(5) Li vir em rastî wan piran tên,ên ku girêdayî ne bi halê Kurda û Ermeniya ê sosyal-ekonomîkî ve,mihaciriya Kurda li ser erdê Ermeniya, ku bi çi awayî Ermeniya ew qebûl kirine.

Dostaniya civaka Ermeniya û Kurda,di xebata Andranîk, Andranîk,G.S.Êrevanyan,Vahê Hayk,Sarkîs û Mîsak Bdêyan de rind hatiye xûyakirin.(6) Lê xwediyê van kîtêban bi hîmî li ser peywendiyên civaka Kurda û Ermeniya ya qeza Dêrsimê,Çarsancaqê,Erzirûmmê,Xarbêrtê (Xarpêtê n.m.) sekinîne û di şîrovekirinê de jî ne hewqas rast in.

Gelek pêşewtiyên întelîgensiya Ermeniya yên pêşî derheq peywendiyên dostaniya Ermeniya û Kurda ya di warê edebî û medeniyetê de nivisîne,pirs pêşde kişandine,da ku di nav Kurda de xebata ronahiyê firekin,bi dîrok,edebiyat û folklora wan a bi rûmet ve mijûl bûne û kemaa wê ya mezin dane kivşêDi vî warî de bi taybetî,xebata ronakbîrên Ermeniya yên navdar X.Abovyan,Komîtas, M.Tîgranyan xwedî rûmetek mezin in.(7)

Hinek dîrokzanên Evropayê jî di derheq peywendiyên civaka Ermeniya û Kurda, dostaniya wan de nivisîne,lê helbet,di şîrovekirina pirsan de ew li ser dereca ramanên xwe yên burjuvazî mane, wekî mîsal; L.Rambot, Rohrbach, Vamberu û yêd mayîn.(8)

Şerkariya civaka Ermeniya û Kurda ya pêkve li hember Hukumeta Sultaniyê,her ûsa di xebata A.Safrastiyan ya bi navê "Kurd û Kurdistan"ê de hatiye kivşkirinê.(9) Hinek qeneatên li ser dostaniya civka Ermeniya û Kurda, em di kîtêba S.Exyazarov de dibînin, ku navê wê "Kurdêd Qeza Êrêvanê" ye.(10).Profesor Exyazarov,bi salan nasîna xwe daye dîroka civaka Kurda,jiyana wê ya sosyal-ekonomîkî, rabûn-rûniştina wê,peywendiyên wê bi civaka Ermeniya re,paşê dest bi vê xebata zanistî kiriye.

Dîrokzanê Ermeniya yê bi navûdeng Lêo, ku gelekî rind hay ji dîroka civaka Kurda hebû, di derheq peywendiyên van herdu civakan de ne ku her tenê nivisiye, lê ewî her wisa di wextê xwe de di bajarê Tiflîsê de ji bo civakê bi vê temayê ve gelek caran ders û konferans dane.(11)

Pêşewitiyên(dilsozên n.m.) întelîgensiya Ermeniya yên pêş Raffî,S.Haykûnî, G.Çilînkêryan, Cruvantsiyan, Mamûryan, A.Çopaniyan û gelekêd mayîn jî, di xebat, miqale û bîranînê xwe yên rêwitiyê de, pirên dostaniya herdu civakên cîran bilind kirine.Her ûsa dîrokzanên Kurda Mele Mehmûd Bayazîdî, Nûrî Dêrsimî û yên mayîn di derheq vê pirsê de nivisîne.(12)

Divê neyê ji bîrkirin ku gelek dîrokzan,etnograf,edebiyatzan û cîhanzanan di derheq peywendiyên civaka Ermeniya û Kurda, dostaniya wan de nivisîne.(13) Lewra gelek dîrokzanên burjuvanasyonalîst wê yekê înkar dikin û bêserî çavên xwe li ber hezaran îsbatiyan digrin, naxwazin wê yekê bibînin.Ew ji bîr dikin,ku dostaniya van herdu civakan di nav şerkariya wan a pêkve de di nava peywendiyên wan ên medeniyetê û edebiyatê de qal bûye. Vê yekê di nava dîrokzanên Tirk wek Şewket Sureya(Aydemîr),Huseyîn Saracoglu, Alî Kemal, Alî Fuat Cebesoy û yêd mayîn de têne kivşê. Piştî Şoreşa Oktobrê ya Sosyalîstî ya Mezin ji bona pêşdêçûyina Kurdzaniyê mecal hatin sazkirinê û wek ilimdarên Ermenî yên Kurd jî guhdariya xwe dan ser pirsa dîroka peywendî û dostaniya civaka Ermenî û Kurda. Di vî warî de xebata M.G.Nêrsîsyan, Ê.Sêrgîsyan, X.Avdalbekyan, G.Şaroyan, H.Gazaryan, C.Avarêsov, M.Hasretyan, N.Xalfîn, M.S.Lazarev, X.M.Çetoev, Celîlê Celîl û ya yên mayîn berbiçav in.(14)

Di derheq dostaniya civaka Ermeniya û Kurda de her wisa em di nav xebat û afirandinên bedewtiyê yên Ereb Şamîlov,H.Cindî, Casimê Celîl, Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Nado Maxmûdov de dixwînin.Gelek şair û nivîskarêd Ermeniya di derheq dostaniya van herdu civakan de nivisîne, qenaetên efrandinên xwe ji folklora civaka Kurda ya cewahir hildane.Her ûsa, wan ji dil û can di derheq Kurdên Ermenîstana Sovyetiyê, pêşdeçûna jiyana wan de, dostaniya civaka Ermeniya û Kurda ya ku di rojên me de navarokeke teze stendiye, dinivîsin.Şair û nivîskarên Ermeniya Avêtîk, Ishakyan, Dêrênîk Demirçiyan, Stêpan Zoryan, Hiracya Koçav, S.Taronsî, Sarmêr, V.Karêns û gelekên din, her wiha bûn dengbêjê wê dostaniyê.Ji bilî wan, ronakbîr û niviskarên Ermeniya yên welatên dereke di derheq vê pirsê de cî dane xebatên xwe.(15)

Ji bilî van xebatên eşkere, her wiha materyalên arşîvên Moskovayê, Lenîngradê Êrêwanê û Tiblîsê jî wek çavkaniyên esasî tên hesibandin. Lê gelek qenaet û bîr û baweriyên giranbiha yên pêwist me ji presa Ermeniya ya qirnê 19-20 hildaye. Gelek rojname û kovarên Ermeniya di rûpelên xwe de di derheq dostaniya Ermeniya û Kurda de nivisîne, li siyaseta hukumeta Tirkiyê ya li ser miletan a kirêt rexne girtine,dengê xwe bilind kirine ji bo tekûzkirina dostaniya van herdu civakên kevnare(qedîmî).Mişak, Taraz, Lûma, Mêx û Hayestanî,Nordar,Arêvêlyan Mamûl,Anahît,Ararat,Arzaguk û gelekêd dinê ji wan in.

Em li nava Ermenî û Kurdên ku ji Ermenîstana Roavayê û ji Kurdistanê revîne û îro di Ermenîstana Sovyetiyê de bingeh girtine, geriyane û me gelek qinyatên bi zar(devkî) ji wan hildaye.

### DOSTANIYA CIVAKA ERMENIYA Û KURDA Û ŞERKARIYA WAN LI DIJÎ DAGIRKERAN

Dostaniya civaka Ermeniya û Kurdan ji kûraya qirnan tê. Dîrok nîşan dide,ku ev herdu civakên cînar li rex hev li ser erdê xwe yê dîrokî jiyane,qedera van herdu civakan, bawerbikî nola hev bûye. Wan gelek caran, pêkve mil kutane milê hev li hember her dagirkerek ji bo ji zêrandinê xelasbin, şer kirine.

Di derheq hevkariya van herdu civakan de dîrokzanê Ermeniya yê bi nav û deng Lêo dinivîse ku,"...nêzîkbûna wan a ku ji qirna tê,bêfîtiya hukumekî mezin li ser herdu civakan hiştiye, gelek caran jiyana wan a kulturî bûye nola hevûdu. Ji qirnê yekê de şahidiya Strabon heye,ku bi fikra wî Ermenî û Mar miletek bûne, çimkî xuyakirina dereca nolanî, hevbûna kincên,rabûn û rûniştinên û hela zimanên wan herdu civakan hewqas mezin bû, ku wî vê fikrê pêş dê dikişand. Ji bo îsbatkirinê, şahidiyên bi vî awayî yên mayîn jî hene, ku hê ji berê de di Ermenîstana Rohilatê û Cenûbê de peywendiyên kulturî hatibûn sazkirin, ku Ermeniya û Kurda bi peywendî û hukumkirina xwe ya li ser hevûdu, gihaştibûn ramanek mişterek û qeydekî mişterek".(1)

(Dom dike)

---

## Bîranînên Generalekî Tirk

*Cemal Madanoğlu*

*Werger : Alîşêr*

ÇEND PEYV

**Bi vê hejmara xwe em dest bi bîranînên generalekî Tirk, Cemal Madanoglu dikin. Cildê yekem ê bîranînên wî ji bira çara pê ve li ser dewra eskeriya wî ya Kurdistanê ye. Gelek buyerên balkêş di bîranînên wî de hene. Loma jî me hêja dît ku wergerînin Kurdî û pêşberî we xwendevanan bikin.**

**ARMANC**

### Wezîfa Rojhilat û Buyerên Tund

Ji 30-yê îlona 1929-an û heta 28-ê Tebexa 1933-an,min li Nîxde,Alaya 12-an û di Boluka 7-an de wezîfe kir.Li vir,min têgihiştinî û zanistiya xwe qasek pêş de biribû.

Di ordiyê de azînek(metod) heye.Divê tu her ciyê Tirkiyê bibînî;li her ciyê bixebitî.Yek ji wan jî wezîfa Rojhilatê ye.Ez bawer dikim,ku dora min jî nêzîk bûbû,loma jî pêşî ji bo Rojhilata Nêzîk;ji bo tabura sinorê ya sisiyan a Cizîrê û fermanberiya çekên otomatîk ez hatim tayînkirin.

Li Nîxdê,riya hesin a nû jî vebûbû.Min haziriya xwe kir û li trênê siwar bûm...

Heval dest dihejînin.

Ez jî silavê didim wan.

Ez ji Nîxdê derketim.Em geriyan,zivirîn û hatin Îslahiyê.Di wir re ji derbasî Mêrdînê..

Ez li Mêrdînê ji trênê peya bûm.

Eskerek înzîbat hat,silavek da min:

-Ezbenî hûn kî ne?

-Milazim(Sitwan dû) Cemal.

-Emrê fermanberê Alayê ye:Heya hûn wî nebînin,dê hûn neçin Cizîrê.

Emir emr e.

Îstasyona trênê li jêr e.Mêrdîn li jor e.Em bi fetil û fetil radipelikin jorê.Em derketin.Em çûn xanekê û li wir bi cîbûm.Min riha xwe jêkir.Ez çûme himamê,min xwe şûşt û pirsa qarergeha Alayê kir.Wextê ez çûm wir,min dît,ku di qerargeha Alayê de qet serbaz tunene.Qerargah xaniyekî piçûk e.Fermanber jî tune.Jina wî li ber zaroanînê bûye û çûye ba wê.Ji xwe,di Qerargahên Alayên Sinoran de zêde serbaz tunene.Roja din,carek din ez çûm wir.Cardin kes tune.

Min got;dê ezê herim.

Li sûkê,bi şofêrê kamyonekî ku dê here Cizîrê re,me li hev kir.Ciyê rexê şofêr û ber pacê,du not û nîv(du panot û nîv) bû.

Wext hat.Em li erebê siwar bûn.Kamyon wek otobûsê tê bikaranîn.Di dawî de,bi mêr û jin birek rêwî.Em li pêşî ne. Li rexê şofêr,mirovek bi cizme û bi qapotek sivîl heye.Ez li milê rast û rexê pacê me.Me derî girt.Miawinê şofêr li derve li ser kapangan,li piya disekine.

Em ketine rê û diçin.

Ez nizanîm em çiqas çûne,di navekê re ku min berê xwe bi aliyê şofêr de zivirand,min dît,ku mirovê li rexê min rûniştiye,li serê wî şewqekî eskerî heye.

Û li ser şewqa wî jî du sirme hene.

Wî wextî heta yuzbaşiyan(serwan) sirmek tenê bû.Heta albayan(serheng) du sirme bûn.Generalan,sê sirme bi der û dorên şewqên xwe vedikirin.Tê wê manê ku rêwiyê li rexê min,binbaşî(sergurd),yarbay(serheng du) û an jî albay(serheng) bû:

-Ezbenî,ez Fermanberê Tivingên Makînan ê Tabura Hidut a Cizîrê Milazimê(tegmen-sitwan du) yekem Cemal...

-Wey ezbenî,tu ew î?

Herdu destên xwe avête sitûyê min û mirç û mirç herdu hinarikên min maçî kir.Pişt re gotinên xwe domand:

-Ez jî fermandarê te yê Taburê me.Ew Celalê yuzbaşî(serwan) heye,ew,ez di rûyê wî de ketim timarxanê û niha paş de vedigerim.Ezê muhra taburê bidim te û tu dê bibî serbazê kargerandinê;tu dê nehêlî ew Celalê yuzbaşî ji xwe bi ciyekî de bilebitîne.

Pişt re destên xwe da ber pozê xwe û bi teqlîdê zirnê meqamekî govenda eskerê behrê lê xist.Ez jî,enîşka min li derveyê pacê,bi destê xwe ez li derî dixim û li gora meqamê tempo didomînim.Bi vî awayî em gelek rê meşiyan.Pişt re westiya,sekinî.

Lê çi heye,ku wextê min tempo didomand,di navekê re min serê xwe di pacê de derêxist derve û min piyê miawinê şofêr ê li derve li ser kapangan û li ser piyan sekinî bû,dît.Heta çoka wî bi mitayên Emrîkî ve hatibû pêçandin,li ser mitayan xwînek pejiqî ya hişk bûyî...

Dom dike

# Destqirêjiya Saddam dirêjî Swêd jî bû.

* Li Swêd, li bajarê Eskîlstuna jin û mêrek Kurd hat kuştin.

* Li gor nasên wan û li gor rojnaman, destê rejima Saddam a Iraqî di vê cînayetê de ye.

**Roja 29 ê Gulana 1986 a, li Swêd li bajarê Eskîlstuna, jin û mêrek Kurd ji Kuristana Iraqê li nav daristanê kuştî hatin dîtin. Destê wan ji pişt ve hatibû girêdan û hatibûn xeniqandin.**

Brahîm û Befrîn her du jî ji Kurdistana Iraqê bûn û ji ber zilm û zora rejima xwînrêj a Iraqê reviyabûn hatibûn Swêd. Li Swêd 6 meh berî kuştina xwe zewicîbûn, bi hêviya jiyanek nuh û bextewar diçûn ziman hîn dibûn kar dikirin.

Lê dijminên gelê Kurd li vir jî dev ji wan bernedan û wan qetil kirin. Li gor rojnama Swêdî Aftonbladet di hejmara xwe ya 2 ê Hezîranê de dinivîse şika mezin jê ewe ku Muxaberata Iraqî li pişt vê cînayetê ye. Cardin di hejmarek xwe ya dinê de rojname dide xuyakirin ku Brahîm û Befrîn berê bi jehrê û dawiyê jî di avê de hatine xeniqandin. Serê pêçîkên Befrîn hatine şewitandin. Ev buyer jî dide xuyakirin, ku berî mirina wan îşkence bi wan hatiye kirin. Jahriya ku ji canê wan hatiye tespîtkirin, talîum e ku gelek caran Muxaberata Iraqî ji bo kuştina muxalifên xwe bi kar tîne.



Befrîn......

## Ev ne Cînayeta Ewilîn e

Li gor Aftonbladet dide xuyakirin wê cînayeta han ne yekemîn karê destqirêj ê rejima Saddam e. Di Sibata 1979 a de dîplomatên Iraqî ji Swêd hatin qewirandan, ji ber ku bi tevkariya polîsekî Swêdî îstixbarat di derheq mihaciran de kom dikirin.

Di 1983 ya de du hemwelatiyên Iraqî hatin hukumkirin ji sucê civandina îstîxbaratê di derheq mihaciran de.

Di Adara 1984 a de dîplomatê Iraqî Xaîb Hassan demançe li meşdarên meşa dijî Iraq kişand. Gava Aftonbladetê jê pirsî go: ''Ez hazirim ku careke din jî vê yekê bikim.''

Jê pêştir du cînayetên ne eşkerebûyî jî hene.

Di Adara 1985 a de Mecîd Husên li dervayî Stockholm, li Grodîngê mirî hat dîtin. Laşê wî hatibû perçekirin Husên berê ji polîsê Swêd re dabû xuyakirin ku ji Muxaberata Iraqî bazdaye û muxaberat dixwaze wî bikuje. Lê polîsê Swêd jê bawer nekiribûn.

Di Tîrmeha 1985 a de Kurdekî Iraqî di mala xwe de kuştî hat dîtin. Bi kêrê hatibû kuştin. Hemû Iraqî pê dizanin ku ev her du cînayet jî karê Muxaberata Iraqî bûn. Lê hukumeta Swêd heta îro bi xurtî li ser van kar û barê qirêj ranaweste û ji xelkê re tiştekî berbiçav diyar nake.



Brahîm .....

Rejima Iraqî ya xwînrêj ji bo xwe li ser kar bihêle, çi ji dest tê dike. Ne guh dide, qanûnên navnetewî û dîplomasî, ne jî guh dide mafên mirovatî. Her roj pirtir destê xwe di xwîna Kurda û Ereban da dike. Lê heta îro tu rejîm bi xwînrêjî li ser lingan nemane, rejîma Iraqî jî nikare bimîne.

Zû yan dereng lê helbet rojekê wê di xwîna Kurdan û hêzên din de bixeniqe. Ev karê qirêj wê li ba Saddam bê hesab nemîne.

●

## Semîner li ser Serîhildana Şêx Seîd

**Li Uppsalayê di 1 ê Hêzîranê de Serîhildana Şêx Seîd bi semînerekê hat bi bîranîn.**

M. Emîn Bozarslan li Uppsala li Komela Kurdên Uppsala li ser Serîhildana Şêx Seîd samînerek da. Wî di destpêka axaftina xwe de got ku ez vê axaftina xwe ne wek semînerekê, lê wekî sohbetekê qebûl dikim.

M.Emîn Bozarslan di destpêkê de bi kurtayî li ser rewşa Tirkiyê û Kurdistanê ya berî serîhildanê sekinî, qala xebata Kemal di nav Kurdan de û sozên ku dabû wan kir. Û di dû re jî bi zimanekî gelek hêsa sebep û armanca serîhildanê anî zimên. Wî di axaftina xwe de çend mînak jî ji hin êrîş û qetlîamên dîktaroriya Kemal da.

M. Emîn Bozarslan di dawiya axaftina xwe de got ku ''Şoreşa Şêx Seîd'' tu têkiliya wê bi Îngilîzan re tuneye û tiştên ku di vî warî de hatine nivîsandin hemû derew in. Serîhildan pêşverû bû û armanca wê serxwebûna Kurdistanê bû. Û di vî warî de jî belavokek mînak da got ku, di Adara 1925 an de li Kurdistana Jorîn belavokek bi navê ''Beyannama Şêx Seîd'' bi Kurmancî û bi Tirkî hatiye bela kirin. Di vê ''Beyannamê'' de baş diyar dibe ku armanca serîhildanê serxwebûn bûye. Û ev ''Beyanname'' Îsmail Heqî Şewêş veşartiye û di sala 1960 î de di kovara Roja Nuwê hejmara 7 an de hatiye weşandin. Li gor baweriya M.E. Bozarslan ev ''Beyanname'' li Darahênê hatiye hazir kirin.

## Civîna berpirsiyarê PDK-Iraqê

Remzî Şaban, endamê Qomîta Nawendî ya PDK-Iraq di 25 ê meha Gulane (25.5.1986) de li Stockholmê civînek çêkir. Di civînê de zêdeyî 100 kesî beşdar bûn. Berî axaftina Remzî Şaban li ser Kurdistanê û xebata PDK filîmekî bi Îngilizî hat nîşandan. Piştî filîm, Remzî Şaban qala dîrok û xebata PDK kir û got ''PDK ev 40 sale ku di nav xebata siyasî û 25 sale jî ku di nav xebata çekdarî de ye. Û heta nuha zêdetirî 70 hezar şehid daye''.

Remzî Şaban, li ser rewşa Kurdistanê, xebat û têkoşîna partiya xwe û şerê nabêna Îran û Iraqê jî sekinî û got ku, rewşa Iraqê ya leşkerî ne baş e, her roj bi sedan leşker ji leşkeriyê bazdidin û naxwazin şer bikin, ya tên ba me û ya jî xwe teslîmî Îranê dikin.

Remzî Şaban qala şerê pêşmergan jî kir got, ''di meha Gulanê depêşmergan êrîşên dijwar bir ser dijmin. Di êrîşekê de, dijmin 50 kuştî û 500 dîl (êsîr) da. Û me cepxanek gelek mezin jî bi dest xist''. Remzî Şaban li ser têkiliyên nabêna PDK û hêzên din jî sekinî. Di vî beşî de, him di derheqê Yekîtî Niştiman û him jî di derheqê hêzên din de bêtirîn pozîtîf xeber da, êrîşî tu hêzê nekir. Li ser pirsekê gelek rexneyên tûj li Dr.Qasimlo girt.

## Cenazê Eyup verêkirin Kurdistanê


Roja 31 ê Nisanê li Kopenhangê merasima cenazê Eyyûp bû. Piştî heval û hogirên wî xatirê xwe yê dawî jê xwestin, roja 2 ê Gulanê cenaze verêkirin Kurdistanê.

Eyyûp Kemal Adsiz, roja 9 ê Çileyê Pêşîn wenda bûbû, Roja 20 ê Adarê, kuştî di behrê de hatibû dîtin. Qatilên Eyyûp her çiqas heta niha wekî şexis nehatibin dîtin jî, ev aşkeraye ku ji alî hêzên tarî ên neyarê têkoşîna gelê me ve hatiye kuştin.

Ev bûyer hîmên xwe ji provaqasyonên ku vê dawiyê li Ewrûpa Roava bûn distîne.

Eyyûp Kemal 29 salî bû. 29 sal li gor jiyanê ne geleke. Lê, wî di vê jiyana xwe ya kurt de, bi çalakî û bir û baweriya xwe ya kûr ve ji bo têkoşîna gelê Kurd xizmetên giranbiha kir. Ew, di dema xwendina xwe ya navîn de ket nav refên têkoşerên gelê Kurd. Sala 1977 a, dema li Îzmîrê di xwendegeha bilind de dixwend bi aktîfî ket nav xebata DDKD ê. 1978 a de qeyda xwe di Xwendegeha Mamosteyî li Wanê çêkir. Di van dema de, ji ber xebata şoreşgerî hate girtin, 3 heyv di girtîgehê de ma. Di destpêka 1979 a bû endamê PPKK ê û piştî demekê ji bo endamê Komîta Başkalê a partîyê hate hilbijartin. Di wê salê de kete Komîta Karger a DDKD ya Başkale. Di dawiya 1979 a de bû berpirsiyarê Kovara Jîna Nû.

Piştî 12 Îlonê bi biryara partiyê çû Kurdistana Îranê. Demeke dirêj li Kurdistna Îranê ma. Sala 1983 tevî Kongra PPKK a 2. bû. Di kongrê de ji bo endametiya dîwanê hate hilbijartin. Di nîvê sala 1983 ya de li Danîmarkayê bi cîh bû. Wî li Danîmarkê ji bona sazkirina komeleke Kurdistanî ku ji Kurdên her çar perçên Kurdistanê hatine bigre bin baskê xwe, xebat kir. Ew di vî karî de serfiraz bû. Demekê di komîta karger a vê komelê de cîh girt. Dema Eyyûp hate kuştin, Endamê Komîta Ewrûpa û Sekreterê Komîta Danîmarkê a PPKK bû.



*Eyyûp Kemal Adsiz*

Ji ber van xebatên wî yên tu car nayên ji bîr kirin bû, ku di merasima cenazê wî de çi bigre gişt nûnerên partiyên Kurdistanî ku li Danîmarkê temsîl dibin û berpirsiyarê gelek partiyên Rojhilata Navîn beşdar bûn. Di merasimê de axaftina pêşîn nûnerê PPKK kir. Dû vê axaftinê, li ser navê KDK û Partiya TUDEH du kesên din jî axiftin.

Cenazê mêrxas Eyyûp li bajarê wî Başkale hate veşartin. Hêzên mêtingehkaran nehiştin ku gel di dema veşartinê de beşdar bibin, bes rê dan malbata wî tenê. Lê wê hêzên mêtingehkar nikaribin hizkirina wî ji nav dilê gel derxin û wê nikaribin pêşiyê ji gel bistînin ku di şopa wî de bimeşin.



## Şairê mezin Hêmin li Stockholmê hat bîranîn

Di 31 ê meha Gulanê de şairê bi nav û deng Hêmin li Stockholmê ji alî Federasyona Komelên Kurdistan ve hate bi bîranîn.

Wek tê zanîn şairê mezin Hêmin di roja 18.4.1986 an de li bajarê Urmiye di 65 saliya xwe de ji nav me koç kiri bû. Bê guman mirina hozanê mezin ji bo gelê Kurd wendabûnek mezin bû. Federasyona Komelên Kurdistanê jî, ji bona vî şairê mezin bi bîr bîne, xebat û berhemên wî hîn baştir bi Kurdên ku li Swêdê dijîn bide nas kirin ev civîna han amade kiri bû.

Axaftvanê civînê Dr.Cimşîd Heyderî bû. Cimşîd Heyderî axaftina xwe bi lehça Soranî kir. Ew, bi kurtayî li ser jiyan, têkoşîn, şiîr û hunermendiya Hêmin sekinî. Wî, şiîrên Hêmin di sê qonaxan de ji hev beş kir û yek bi yek li ser van qonoxan hûr bû.

Di dema axaftina Cimşîd Heyderî de, şair Xebat Arif jî hin şiîrên Hêmin xwend. Di dawiya civînê de jî, ji Hêmin bi xwe şiîrek wî hate guhdarî kirin. Û piştî wiya jî dengbêj Nasir Rezazî çend şiîrên mamoste Hêmin xwend û civîn dawî hat.

Di civînê de zêdeyî 100 kesî beşdar bûn.

## Werem li Tirkiyê berfireh dibe

Nexweşiya weremê (jana zirav) a ku bi salan berê xeteriya wê ji nav Tirkiyê rabûbû, di van salên dawî de, ji ber giranbûna ebûrê, belengazî, birçitî, zordestî û bê xwedîtiyê dîsa zêdebûye.

Serokê Komela Têkoşîna Li Dijî Weremê ya Tirkiyê di beyanek xwe de da xuyakirin ku, nexweşîna weremê ya ku di salên 70 yi de bi 70 hezar kesî re hebû, îro bi 130 hezar kesî re peyda buye. Berpirsîyarên Wezareta Tenduristî dan xuyakirin ku di 1985 a de 4-5 hezar kes ji nexweşîya weremê mirine.

Li gor îstatîstîkên ku dewlet, sazûmana Wezareta Tendurustî û Fakulta Tibê çêkirine, didin xuyakirin ku di van salên dawî de li Kurdistanê, bi weremê re nexweşîyên dirmî yên zarokan gelek tesîrek mezin li jîyana zarokan dike. Piranîya zarokên ku dimirin ji nexweşîyên dirmî wek, sorik, zature, îshal, xenaxûtik, zerika dirmî ne.

*Despêk r.1*

### *BI DESTPÊKEK TEZE*

*rok û şiklê nuh vekiriye,vê baweriya han e.*

*Armanc berî her tiştî dixwaze bive dezgeyekji bo pêşxistin,xwerûkirin û xurtkirina zimanê kurdî.Pê re jî armanc ew e,ku bi vî zimanê meyî şêrîn li ser hemû pirs û pirsgirêkên,êş û derdên civaka Kurdistan raweste,di rûpelên xwe de cîh bide pirsên civakî,aborî,kulturî,dîrokî,siyaseta welat û navnetewî,rûdan û buyerên zanistî û teknîkî,êş û derdên hîndekarî û tenduristî.Jiyana kirêkar û gundiyên belengaz û bindestên Kurdistanê heta ji dest tê,têxe ber çavê xwendevanan.Rûpelên xwe ji kar û barê nivîskar û ronakbîrên Kurdistanê re veke,jiyana wan,afrandinên wan derxe ronahiyê.Bi her awayî bibe deng û palpiştê tevgera rizgarîxwazî ya millî û demokratîk a gelê Kurdistan,li dijî plan û propogandên dijminê gelê me;dewletên dagirkerên welatê me û dewletên emperyalîst şer bike.*

*Helbet bi hilgirtina karûbarên van pirs û pirsgirêkan qesda me ne ew e,ku em bêjin Armanc bi serê xwe wê serî di hemiyan re derxe.Na.Êş û derd û pirs û pirsgirêkên me yên civakî hewqas pir,têvel û piralî ne,ku ne mumkun e,ku kovar an rojnamek tenê bi serê xwe ji bin barê hemiyan derkeve,wan bi her awayî têxe ber çavê xwendevanan.Hela hela li welatê xerîbiyê û bi imkan û qeweta xwe ya gelek biçûk Armanc tu carî nakeve îdîak wiha mezin.Armanc li gor qewet û îmkanên xwe ji alî xwe de wê dest bavê wan û hewil bide,ku para xebata wê jî di helkirina pirs û pirsgirêkên civaka Kurdî de hebe.*

*Bi hêviyek wilo biçûk lê gelek teze Armanc dest bi weşana xwe ya qonaxa nuh dike.Rojên pêş wê çi şanî me bidin,Armanc wê çiqasî ji van wazîfan bîne cîh,ev jî piçek girêdayî ye bi bal û hewildana xwendevanan û bi taybetî nûçegîhanên Armancê.Armanc bi nivîsandin,gotar,lêkolîn,roportaj û resmên we wê xurttir bibe.Em li hêviya gotar,lêkolîn û namên we ne.*

*Heta jimarek din bimînin di xweşî û serfîraziyê de.*

## Casimê Bekçî hat kuştin

*** Casimê bekçî bi şev dema diçû malê hate gullebaran kirin û piştî 7 rojan li Edenê di nexweşxanê de mir.**

Di dawiya meha Nîsanê de li Wêranşarê Serekbekçî Casimê Ereb hat kuştin. Li gor nûçeyên ku gîhan destê me Casim bi şev saet li dora 22.00 an dema dihere malê tê gullebarankirin. Û piştî vê bi heft rojan li nexweşxana Edenê dimre.

Serekbekçî Casim piştî derba faşist a 12 ê Îlonê ji bekçîtiyê derbasî beşê îstîxbarata siyasî bû. Casim berî vî karê xwe jî merivekî pirrî ne baş û dijminê gelê Kurd û hemû hêzên pêşverû bû. Lê piştî derba leşkerî, wî jî wek gelek kevneperestan bêtir dest bi nerindî û muxbîriyê kir. Wî, bi vê muxbîriya xwe li Wêranşarê qet malbatek û malek ne hişt ku zirar negîhandibe û ji wan hin kes nedabe girtin. Û ji bona vî karê wî, Kenan Evren û serokê urfî îdara Ruhayê ew xelat kirin. ji ber ku wî gelek kes nas dikir û loma jî dikarî bû bêtir muxbîriyê bike. Îcar ji ber vê yekê jî bêî çend kesên xwefiroş, hemû Wêranşariyan ji Casim nefret dikir, ew ji xwe re dijmin û neyar qebûl dikirin. Wî bi vê yeka han dizanî bû û loma jî heta ku jê dihat xwe diparast. Lê belê ne parastina wî û ne jî hevkariya hêzên dagirker - kolonyalîst- nikarî bû wî ji ber xezeba gel xilas bike.

Piştî kuştina Casim, li Wêranşarê bi navê Operasyona C-1 operasyonek gelek mezin hat çê kirin. Di vê operasyonê de hêzên dagirker gelek kesên pêşverû û welatparêz girtin. Pirtirê wan jî bi taybetî Êzidiyên gundên dora Wêranşarê bûn.

# RASTIYA TAL A PIŞT PROPAGANDAYÊN ŞÊRÎN

*Destpêk r.1*

Bi cîh bûna serdestiya Cimhuriyeta Tirkiyê li Kurdistanê, li ser pişta axa, beg, şêx û hin serokeşîrên Kurdistanê pêk hat. Loma jî xwediyê dewleta Tirkiyê, burjuwaziyê Tirk jî li Kurdistan milê xwe da van hêzên kevneperest, serdestiya wan a li ser gundiyan, mal û milk-xwedîtiya wan parast.

## Tifaqek Kevneperest

Bi vê tifaqa kevneperest ji alîkî de bê zevîtiya bi milyonan gundiyan û ji alî din de jî xwedî zevîtiya mezin a destek axa û began heta îro li Kurdistanê ma. Di pêşdehatina dîrokê de her çi qas têkiliyên aborî û civakî hatin guhartin, peywendiyên feodalîzmê cîyê xwe bi peywendiyên sermiyandariyê guhartin jî di rewşa xwedî zevîtiyê de tiştek nehat guhartin. Burjuwaziyê Tirk ji bo ku nîrê mêtingehkariya xwe li Kurdistanê biparêze, xwe tu carî nêzî reforma ziraî nekir û zevî li gundiyên bê zevî û belengaz nehat belavkirin. Lomajî gava têkiliyên sermiyandariyê ketin malbendên gundîtiyê jî, axa cardin xwedî ax û zeviyên xwe bûn. Heta gelek zevîyên gundiyan jî xistin bin destên xwe û milkiyeta xwe berfirehtir kirin.

Îro di Kurdistanê de, di malbendên gundîtiyê de rewş bî kurtî wiha ye.

## Nutqên Vala di Riya Nêçîrvaniya Reyan de

Herçiqas burjuwaziyê Tirk tu carî mil neda ber rakirina rewşa dijwar a aborî û civakî ya Kurdistan, rê li ber pêşveçûna welat girt jî, nimînendên wî, partiyên siyasî û parlamenteran bi hêviya bidestxistina reyên gundiyan, li meydanan, li kursiya parlamentoyê, di radyo û televîzyonê de, bi durûtî nutqên vala avêtin, ahd û peyman dan gundiyan ku wê reforma ziraî çêkin, zevî li wan belakin, wan ji rewşa belengazî û dijwariyê xelas bikin. Heta hin caran pêşniyarên qanûnên reforma ziraî anîn ber parlametoyê. Lê ev nutq, peyman û ahd jî, ev pêşniyarî jî hemû li ber bayê çûn, tu netîce nedan. Lewra armanc ji van karû baran, ne bi rastî başkirina rewşa gundiyên Kurdistanê, lê nêçîrvaniya reyên wan bû.

Di van salên dawî de, bi destpêkirina Proja Anadola Başûrêrojhilat (Guneydogû Anadolu Projesî-GAP) carek din propagande dest pê bûne. Tê gotin ku bi xelaskirina GAP ê wê çol û beyar, deşt û beriyên ziwa yên bê av ên Anadola Rojhilat (Kurdistanê) bên avî kirin, xêr û bereketa cardiniyan qat bi qat zêdetir be, gundî ji halê paşdemayînê, dijwarî belengazî û birçîtiyê xelasbin, tarî wê ji welat rabe, ronahî û şadî di welat de rû vede. Rojnamevanekî Tirk ku meha berê li herêma projê geriya û bi gundiyan re axaft wiha dibê: ''Gire gira bi sedan makînên dêwîn e, dixebitin, mirov çarmedor dibezin, heyecan û faaliyet... Avakirina Bendava Ataturk û Tûnelê Urfayê bi tempoyek ji bo Tirkiyê nedîtî, zû dimeşe. Serokwezîr ji alîkî de, Silêman Demirel ê ku dibêje ''Ez xwediyê projê me'' ji alîkî din de, bi hev re ketine qayişê ka gelo wê kî îmzê bavê bin proja (GAP) ê.

Gurûgola nutqên meydana, axaftinên televîzyonan, toz û dûmana hafriyat û avakirinê...'' (Yenî Gundem h. 9, s. 11 Gulan 1986)

## ''GAP'' Çiye ?

Ev çi proje ye ku, toz û dûman gurûgolek wiha rakiriye. Li her derê dibe sebebê nutq û axaftinan.

Li gor ku hatiye pîlankirin, Proja Anadola Başûrêrojhilat (Guneydogu Anadolu Projesi- GAP), mezintirîn proja dewra cumhuriyetê ye. Proje herêma nav çemên Dîcle û Firatê, jêraliyên van çeman û herêmên jor ên deştên Mezopotamya kevn digre ber xwe. Qadek 74.OOO km2. dikeve nav projê. Bajarên herêmê Urfa (Ruha), Mêrdîn, Entap, Adiyeman, Diyarbekir û Sêrt, hinek ji wan bitemamî hinek jî bi qismî dikevin ber projê. Li gor ku hatiye pîlankirin, bi pêkanîna projê wê li ser çemên Dîcle û Firat 15 bendên avê (baraj) û 18 sentralên hîdroelektrîk bên avakirin.

Armanc ji destpêkirina vê projê pêşvexistina çavkaniyên av û axê yê. Loma jî wê avayiyên avdanê û enerjî bên avakirin. Ji van bendavan (barajan) Karakaya , Bendava Ataturk, tunelên avê yên Urfa, Dêrsim, Akçakale û Ceylanpinar hatine destpêkirin. Hinên din jî pîlanên wan hazirbûne lê hêja dest bi avabûna wan nehtiye kirin, yên dîtir jî hîn di qonaxa pîlanbûnê de ne.

Ev proje di sala 1976 a de destpêkiriye. Ger li gor programê xwe here û bi derengî neyê xistin, temamiya projê wê di 3O salan de xelas bibe. Bi temamkirina vi karî, li gor ku berpirsiyarên dewleta Tirk didin xuyakirin, wê milyonek û 8OO hezar hektar zevî di herêmê de karibe bê avdan û 22 milyar kw-saet enerjiya elektrîkê bê bi destxistin. Vê enerjiya elektrîkê bi serê xwe qasî tevayiya enerjiya elektirîkê ya Turkiyê ya sala 198O yî ye.

Di eslê xwe de proja GAP ê ne projek bi serê xwe ye , ji 13 projên avdan û enerjiyê pêk tê. Heftê wan wê hawza Firatê şeşê wan jî wê hawza Dîcle bigrin nav xwe. Girîngtirîn xeleka projê Bendeva Ataturk û santrala wê ya hidroelektrîkê ye. Ji bo vê bendavê li Adiyemanê qezak (bi temamî) 2 qeza û 3 nehiye (qismî) , li Urfayê nehiyek û 18 gund (temamî), 26 gund (qismî) wê di bin avê de bimînin. Li Diyarbekir qezak (bi temamî) , 2 qeza (qismî) , 4 nehiye (qismî) , 29 gund (bi temamî), 1O6 gund (qismî) wê di bin avê de bimînin.

Li gor hejmartina 198O yî , 55 hezar nifus, bi binavbûna zevî û gundan wê tesîr bigihîje wan.

## Rastî Çiye

Ruyê xuyakirî yê projê, bi debdebe ye. Hela nutq û axaftinên li ser wê ! Tew ew dê û weledên xwe davêjin: Mezintirîn proja Turkiyê, dema biserkeve wê medeniyet û ronahiyê bibe Rojhilata Anadolê (Kurdistanê) . Navê deşta Herranê hê ji niha de hatiye guhertin, buye Deşta Zêrîn (Altinova).

Lê gelo rastiya li pişt vê debdebê û tozûdûmana nutqan çiye? Proje ger wek pîlankirî bi serkeve jî, wê ji piraniya nifusa Kurdistanê re, ji gundiyên bê zevî û belengaz ên welêt re çi bîne?

Hê ji niha ve xuya dike ku ev proje bi meşa xwe ya îroyîn û bi serketina xwe ya rojên pêş, ji mahaciriyê kedxwiriyê û tadayiyê pêştir tiştekî din nabe wan. Bi vê projê kedxwiriya ser gundiyan, bê zevîtiya wan û belengazî hê pirtir dibe.

Avakirina Bendava Ataturk (a li ser çemê Firatê) ku perçek ji projê ye, di rojên pêş de xelas dibe. Turbînên bendavê wê bên girtin û ava çemê Firatê li pişt bendavê wê pingar bide. Bi pingardana avê wek me li jor jî got bi sedan gund, nehiye û qeza wê di bin avê de bimînin. Ma gelo piştî binavbûna wan herêman , wê çi bi serê rûniştvanên wan deran de bê? Dewleta Tirk hê ji zû ve erdê gundiyên wan deveran îstimlak kirine, bi erzanî erd ji destê wan derxistine û zorê didin wan dibêjin ''rojekê zûtir, hûn bi ku de diçin herin, li çara serê xwe binêrin''. Rojnamevanê ku me behsa wî kir, meha berê çû, li nêzîkî 5O gundên herêmê geriya, di roportaja xwe de ci da gilî û gazinên gundiyan. Gundîkî jêre wiha digot ''Tiştê ku di destê me de ye jî diçe. Lê li hemberî wê perê ku didin me îmkana avakirina jiyanek nuh nade me, ka gelo emê niha çi bikin?'' Rojnamevan di roportaja xwe de wiha didomîne:

''Li Kadikoy/Elazîzê muxtar Bayram Kesen got: 'Li gundê me yê dused malî hin xwedî zevî ne, lê hinên wan jî bê zevî ne. Ên bi zevî jî û bê zevî jî maxdûr in. Serê m2 a erasan di nabêna 15-8O lîrayî de buha lê birîn. Ka bi vî pereyî çi tê?'

Abdullah Kesen gundiyê muxtar e. Got '3O donim zeviyê min heye, hukumetê 3 mîlyon daye min. Ez vî pereyî di salekê de ji zeviyê xwe qezenc dikim'. Muxtar Bayram Kesen lê zêde kir 'rast e dewlet wê ji vî karî gelek qezenc bike, av û elktrîk wê pir bibe, lê di vê navê de emê jî bicehimin herin. Heke dewlet karekî hewqas mezin bi cih bîne , bira me jî maxdûr neke'.

''.... Li gundê Tillê Mistefa Yilancî derdê gundiyan anî pêş: 'Xuya ye emê çibikin: Ji dêlva em bi zeviyên xwe, heywanên xwe bibilin, emê herin di zeviyên avdayî yên deşta Herranê de, rêncberiya axên wan deran bikin. Dewlet wiha dixwaze. Dixwaze ber zêde bibe. Wê gavê jî ji bendavê avakirin pêştir tu çare nîne. Qedera me ev e. Em nikarin kêfxweş bin, Çimkî rojên me yên dijwar gelek nêz in, em nikarin xemgîn bin, çimkî ji bo dewlet û millet wê qenc be'.

Gundîkî peyva Mistefa Yilancî birî û wiha got 'ne were ye Mistefa! Dewlet, hukumet heke mezin e, wê karê mezin bike, bira mezinahiya xwe nîşanî me jî bide. Ne karekî qenc e ku me dike mihacir û rencber û xelkê dewlemend dike.''

Belê hê destpêka çîroka projê ev e. Dewlet tu carî nayê bîrê û naxweze ku van gundiyên bê cîwar dimînin li derekê ciwar bike û têra wan zevî bide wan. Bi çend qurûş pere çavê wan digre û dibê ''ji xwe re bi ku de diçin herin''. Ev ne ji nezanî ye. Dewlet wiha bi zanebûn, van gundiyan dixe vî halê xirab da ji Kurdistanê barkin ber bi Rojavayê Anadolê de sirgûn bibin. Ev perçek ji siyaseta şovenî ya dewleta mêtingehkara Tirkiyê ye.

## Biserketina Projê wê Êşek din Bîne

Êş û elema destpêkê ev e. Lê biserketina projê wê carek din êş û elemê têxe nav gundiyên herêmê. Herêma ku proje lê tê avakirin herêmek wilo ye ku li alîkî destek axa, beg û şêx piraniya zeviyan xistine bin destên xwe, li aliyê din bi mîlyonan gundî bê zevî ne, yan jî zeviyê ku di destê wan de ye, têra wan nake. Ferqek mezin di nabêna tebeqên civakê yên malbendên gundîtiyê heye.

Li gor lêkolînek resmî ya dewletê di 1964 a de li Diyarbekir ji %47, li Adiyemanê ji %34, li Urfayê ji %55 ê, li Dêrsimê (Tuncelî) ji %37 ê, li Mêrdîn ji %4O,9 ê û li Sêrtê ji %42 nifûsa gundiyan bi temamî bê zevî (erd) bûn.

Dîsa li gor îstatîstîkên Enstîtuya Îstatîstîkî ya Dewletê yên 197O yî li Diyabekir ji %57,1 ê gundiyan, hew xwediyê ji %7,9 zeviyên ajotî ne. Li Adiyemanê ji % 4O,8 ê gundiyan ji % 4 ê erdan, Urfayê ji %83 yê gundiyan ji %35,3 yê zeviyan, li Dêrsimê ji %54,7 ê gundiyan ji %17,4 ê zeviyan, li Mêrdînê ji %69 ê gundiyan, bes ji %15,1 ê zeviyan, li Sêrtê ji %69,1 ê gundiyan ji %9,7 ê zeviyan di destê xwe de girtine. Ji alî din li Diyarbekir ji %43,1 ê zeviyan di destê ji %3,8 nifûsê, li Adiyemanê ji %38,3 zeviyan di destê ji %3,6 ê nifûsê de, li Urfayê ji %26 ê zeviyan di destê ji hezarî 9 ê nifûsê de, li Dêrsimê ji %25,1 ê zeviyan di destê ji %4,5 ê nifûsê de, li Mêrdîn ji %1O,7 ê zeviyan di destê ji hezarî 1 ê nifûsê de, li Sêrtê ji %3O,1 ê zeviyan di destê ji %1,8 ê nifûsê de ye.

Li gor rapora TUBITAK*ê ku îsal daye heyeta wezîrên Tirkiyê li Herêma Anadola Başûrêrojhilat (bi piranî ji van bajarên navdayî pêk tê) ji %51 ê gundiyan bes ji %7 ê zeviyan dajon. Li alî din ji %8 ê nifûsê %53 ê zeviyan di bin destê xwe de dihêlin. Qismê yekem ê xwedî zeviyên biçûk in. Piraniya wan zevî têra jiyana wan nake jî. Dîsa li gor wê raporê ev qisim ên ku xwedî zevî ne, zeviyê wan ji 25 dekarî ne berjortirin. Lê li alî din xwedan zeviyên mezin ên ku me li jor îstatîstîkên wan da zeviyên tu kesî ji 5OO dekarî kêmtir nîne. Gelekên wan ji 5OOO dekarî zêdetir zevî di bin milkiyeta xwe de diparêzin.

Ferqîtiya tebeqî di rewşa milkiyetê û têkiliyên aborî de ev e. Bi pêşveçûna têkiliyên sermiyandarî di malbendên gundîtiyê de ev ferqa han kurtir û firehtir dibe. Ji alîkî de xwedan zeviyên biçûk iflas dikin dikevin nav seffên bê zeviyan, li alî din xwedan zeviyên mezin milkiyeta xwe berfirehtir dikin. Bi destpêkirina proja GAP ê xwedan zevî yên mezin, qismek ji burjuwaziyê bajêr û monopolên Tirk destpêkirine zeviyan dikirin û di herêmên projê de di milkiyeta zeviyan de rêveçûnek ber bi monopoliyê destpêkiriye.

A proja ku tê çêkirin di rewşek wiha de pêk tê. Helbet gava rewşa milkiyeta zeviyan wiha be, biserketina projê ji piraniya nifûsa malbendên gundîtiyê re tiştekî nuh nayne. Ev yek wê jiyana wan ber bi xweşî, şaî û refahê de neguhere. Ên ku ji projê fêde bigrin dewleta Tirk, burjuwaziyê monopolîst ê Tirk, xwedan zeviyên mezin ên Kurdistanê ne, ku ev jî tifaqdarên burjuwaziya Tirk in.

Heta bi pêkhatina projê wê rewşa gundiyên bê zevî, kêmzevî û belengaz ên Kurdistanê dijwartir bibe. Kedxwirî di têkiliyên aboriya ziraî de wê pirtir bibe, yên buhustek erdên wan hebin wê iflas bikin, belengazî, birçîtî û bêkarî li welat berfirehtir bibe. A avakirina projê ji gundiyên Kurdistanê re vê rastiya tal tîne.

Iro dibê herkes baş zanibe ku projek wiha bes bi şertekî kare jiyana malbendên gundîtiyê ber bi xweşî û refahê de buguhere. Ew jî ku proje li ser esasê şoreşek ziraî bê avakirin. Berî her tiştî divê zevî li gundiyan bê parvekirin, herkes têra xwe zevî bi dest xe, bê zevî û kêm zevî nemînin. A piştî gavek wiha pêwîst ger proje bê avakirin, rewşa gundîtiyên Kurdistanê wê ber bi xweşiyê de here, welat bighîje şaî û ronahiyê.

Lê dîsa divê em baş zanibin ku, çewa bi avakirina vê projê armanca dewleta Tirk ne xweşkirina jiyana welat e, her wiha jî ew tu carî naxwazin û heta ji wan bê rê nadin ku şoreşa ziraî di Kurdistanê de çêbibe. Ne şoreş, ew naxwazin reformek sivik jî di malbendên gundîtiyê de çêbibe.

Baş eşkere ye ku şoreşa ziraî di welat de hişk girêdayî ye bi mesela serxwebûna Kurdistanê ve. Tevgera rizgarîxwaza welat ger biserkeve, hîn wê gavê rê li ber şoreşa ziraî a malbendên gundîtiya Kurdistanê vedibe. Hîn wê çaxê wê jiyana gundiyên Kurdistanê ber bi xweşî û refahê de biguhere. Hin wê gavê wê welat bighê şaî û ronahiyê.

Tiştên ku îro ji burjuwaziyê Tirk ê mêtingehkar tên, bes nutqên vala ne, durûtî ne.

*(*) TUBİTAK: Sazûmana Lêkolînên Îlmî ya Tirkiyê.*

●●

# ŞAIRÊ MEZIN Ê KURD HÊMIN JÎ KOÇ KIR

*Destpêk r.1*

yên xwendinê tesîr li ser jiyana wî ya edebî û efrandinên wî kir. Mamostê wî Fewzî di têgihîştina wî de rolek girîng lîst. Wî bi edebiyata klasîkî ya Kurdî û bi edebiyata Farisî da naskirin.

1938 a de, Hêmin dev ji dibistanê berda vegeriya gundê xwe, dest bi kar û barê gund kir. Di vê demê de bi edebiyata Kurdî û Farisî jî dibiliya. Di sala 1941 ê de dest bi nivîsandina helbestan kir.

Komela Jiyanewey Kurd di Tebaxa 1942 ya de hat damezrandin. Hêmin jî bû endamê vê komelê. A navê ''Hêmin'' di dewra vê endamtiyê de li xwe kir û ji wê rojê pê ve bi vî navî hat naskirin. Piştî ku bû endamê Komela J.K. jiyana wî bi temamî hat guhartin, di riya rizgariya welat de wek têkoşcrekî şoreşger ket xebatê. Di dewra Cumhuriyeta Demokratîk a Mehabad de wek kadirekî aktîf di organên cumhuriyetê û yê partiyê de cîhê xwe girt.

Hêmin di dema jiyana xwe de gelek helbest nivîsand. Helbestên wî di gelek kovar û rojnamên Kurdî de hatin weşandin, wek dîwan hatin çapkirin. Tarîk û Ron (1974) efrandinek wî ya hêja ya bi nav û deng e. Berî mirina xwe li Urmiyê bi navê ''Surwe'' (Sur) kovarek edebî derdixist.

# PÊŞMERGE PÊŞDE DIÇiN

*Destpêk r.1*

xuyakirin, tugayek baştirîn a Yekîtiya Mihafizî ya Saddam bû.

Bi serfiraziya hêzên çekdar ên Kurdistan bajarê Mengeşê û gelek erd hat rizgarkirin.Pêşmergan nêzîkayî li Dihokê kirine û wê ji berê hêsatir karibin xwe bighînin Mûsilê.

Li gor ku rojnamên Awrûpî ji şîrovedikin,herêmên rizgarkirî xwedî ehemiyetek stratejîk in. Bi berdewamiya serfiraziyê, riya erdê ya nabêna Tirkiyê û Îraqê û xeta petrolê ya nabêna herdu dewletan kare têkeve bin destê hêzên şoreşa Kurdistanê.Rojname û dîplomatên Awrûpî şîrovedikin,ku bi rûdana bûyerek wiha mêzina şerê Delavê Basra kare biguhere.

Li alî din biserketina hêzên pêşmerge û nêzîkbûna wan a ber bi rê û xeta petrolê, xewa Tirkiyê jî revand. Li gor ku rojnamên Tirk dinivsînin;li ser vê ''xeteri''yê hukumeta Tirk bala hukumeta Îranê kişand û jê xwest,ku piştgiriya xwe ji Kurdan bikşîne.Qasî ku rojname dinivsînin,ger hukumeta Îranê daxwazên Tirkiyê bi cîh neyne wê gavê wê Tirkiye leşker bişîne ser pêşmergan. Rojnamên Tirkî dinivsînin ku di derheq vê meselê de tu dudiliyek ji hukumeta Tirkiyê re çênabe û gava menfaetên xwe di xeteriyê de bibîne wê êrîş bibe herêmê.

Bi vê buyerê carek din eşkere dibe,ku dîktatoriya faşîst a Tirkiyê,bi dagirkirina Kurdistana Tirkiyê têr nabe,çavê wê li perçên din ên Kurdistanê ye jî.Ew ne ku bes tevgera rizgarîxwazî ya Kurdistana Tirkiyê lê ya hemû perçên welat li dijî xwe xeteriyek mezin dibîne.Û ew hêsab dike,ku rizgarbûna Kurdistana Îraqê wê roja rizgariya Kurdistana Tirkiyê nêzîktir bike.

Loma jî ne ku bes rejima Baas a Îraqê lê dîktatoriya faşîst a Tirkiyê jî îro bi hemû hêz û îmkanên xwe ve li hember şoreşa Kurdistana Îraqê radiweste. Şoreşa Kurdistanê û hemû hêz û partiyên Kurdistanê jî divê vî hesabî bikin.Divê baş bizanibin,ku xelasî di riya şerê li dij dîktatoriya Tirk û pîlanên wê re derbas dibe.Di vî şerê pîroz de divê hesabê dîktatoriya hov û har a Tirkan jî bê kirin.

# HEVPEYIVÎN...

*Destpêk r.8*

kiriye.Wek ku min li jorê jî gotibû,dixwazim ku wana bi pirtûkeke cihê ve raberî xwendevanan bikim. Buhayê van gotinan ez pir bilind dibînim. Çimkî evana nimûnêd toreya Kurdî yên sedsaliya navîn in:Filosofî û bîr û baweriya gelê me yê berve ku bi zar hatiye gihiştiye me,heta roja îro.2000 çîrok û çîvanokên kurdî yên ku me berhev kirine û Ji şirîtên dengnivîsokê ber girtine hîn neketine ber çapê.

Tiştekî dinê jî heye,ne li ser zargotinê ye.Min û hevaljina min Gulîzara Casim,me bîbliyografya ser Kurdên Ermenîstanê li dora 1000 rûpelî bona çape amade kirine.

**ARMANC: Tu gotinên we ji bo rojnama Armanc û xwendevanên wê hene?**

C.CELÎL: Xwestina min e,ku Rojnama Armanc hemû bi kurdî derê û bêtir guh bidne ser huner û çanda Kurdî.Eger karîna rojnamê bigihîje,ku wêneyên li sêr jîna Kurda ên etnografî,kevn û nû çap bikin;wê tiştekî baş be. Ez di nava kovarêd kurdî de nabînim,ku gotarêd li ser rabûn û rûniştinêd kurdî,li herêmeke Kurdî bi rewşeke rengîn ku çewa govend û şahiyên xwe derbas dikin,derxistine. Di vî warî de divê bi hûrgilî bê nivîsandinê.

Sipas.

HEVPEYVÎN

# Dr. CELÎLÊ CELÎL:

# ''Xwedî li Zargotinê derkevin, da em dawiyê nebêjin ax û wax !''

*Dr. Celîlê Celîl,wek tê zanîn dîrokzanekî Kurd e.Lê qandî xebata wî li ser dîroka Kurdistanê dibe,hewqas jî heskiriyê zargotina kurdî ye.Heta niha di derheqa zargotina kurdî de gelek pirtûkên wî hatine çapkirin û hîna jî xebata xwe didomîne.*

*Rojnama me ARMANC ev cara duwemîn e li gel Mamoste Celîlê Celîl hevpeyvîn dike.Cara yekem,wek ku xwendavanên me dizanin di sala 1982-an de di derbarê kurtejiyan û xebata wî ya li ser dîrokê bû.Niha jî em dixwazin bi vê hevpeyvînê di warê zargotina kurdî de xebat û nêrînên wî raberî xwendevanan bikin.*



*Dr. Celîlê Celîl û hevaljina wî, axaftvana (spîkêra) radyoya Erîvanê ya beşê Kurdî Gulîzara Casim.*

**ARMANC: Mamoste, wek tê zanîn li ser dîroka Kurdistanê we doktora xwe kiriye û di vî warî de gelek hilberiyên we yên giranbiha çêbûne.Her wekî gelek pirtûk û gotarên we bi zimanên cûre-cûre hatine weşandin.Lê em dinêrin bi qasî xebata we li ser dîrokê dibe,hewqas jî xebata we li ser folklora(zargotina) kurdî dibe.Çima folklora kurdî û ne tiştê din?**

C.CELÎL: Bi rastî,pêşxwendina xwe ez mêjûnas im û li ser mêjûya Kurda ya Sedsala Nozda min doktoriya xwe bi serî kiriye.Ê ku bi mêjûya Kurda ve mijûl bibe,zêde zêde sedsaliyên kevin ve mijûl bibe çetnayî û serêşiyên pir hene.Çêtnayiya esas(hîmî) ew e,ku malûmatê ser Kurdan kêm gihiştine destê me.Her mêjûnas gava dixwaze mêjûya gele xwe binivîse bi giranî malûmatan ji kovar,rojname û pirtûkên bi zimanê xwe digre.Em jî zanin ku bi dewraneke bi dûr û dirêj van tiştana bi zimanê kurdî tunebûne.Vêca em mecbûr dibin,ku destê xwe dirêjî çapkirinêd zimanêd cînar û Ewrûpî bikin.Ji bona vê xebatê divê em dûr û dirêj rûnin,bi roja,bi meha û bi sala rojname û kovarêd ingilîzî, fransizî, talî,almanî,rûsî,êrmênî,erebî,tirkî û êd mayîn vekin,bixwînin û ji nava wana nivîsarêd ser Kurda derxin,berhevkin û bêjingkin,da ku dîtineke giştî ji xwe re peyda bikin.Ev yeka di nava gelek salan de min kiriye û kêfa min pêre hatiye û netîca vê xebatê ji we re diyar e. Ango niha ez li ser folklorê mijûlim,sedem ne ew e,ku ji van çetnayiyên jor-gotî tirsiya me.Na xêr.Têgihiştineke dinê di nava van salan de ji min re peyda bûye.Ev Çiye?

Wek hûn zanin Ordîxan,birayê min,zargotinzan e.Ji berê ve ew bi berhevkirina nimûnêd zargotina kurdî gîro ye(karwer e).Gava Ordîxan diçû gunda û zozana ku van tiştan berhevke,ez jî pêre diçûm û me bi tevayî nimûnêd zargotinê dinivîsand.Hêdî hêdî hiskirineke mezin ber bi zargotina Kurda di nava canê min de gulveda.Min dît çawa zargotina me ya rengîn,zar û zimanê kal û bava yê şêrîn bere-bere diçilmise û rewşa xwe winda dike.Di rojêd me de neslê nû li pey gotinîêd kevn naçe,ji ber vê yekê kêmanî dikeve nava zanîna zargotina Kurda.Bi giliyekî,zargotina kurdî ber bi windabûnê ve diçe.Çi ku îro hebe wê sibê tunebe.Di vî warî de dem dijminê me bû.Eger îro em vê yekê nekin,sibê em nikarin bikin.Bi mirina her kalekî û her pîrekê re tiştekî buha tevî wana diçe gorê.Bangîna dilê min ez mecbûr kirim,ku xebata xwe di warê berhevkirina zargotinê de berdewam ,bikim.Eger di salêd 50-î de karê berhevkirina zargotinê ji aliyê me de ne sîstematîk bû,salêd 60-î êdî me destpêkir.Her meh,herêm bi herêm,gund bi gund em bigerin,ji zarên zanayên zargotinê hemû rengî gotinêd kevnare binivisînin û li ser şirîtên dengnivîsokê(teyipê) tomarkin.Ev jî hîn hinik bû.Diva bû wan bi rêk û pêkkin û nivîsarên xwe bikin pirtûk û raberî xwendevanan bikin.Gava çend pirtûkên me di warê zargotinê de keti meydanê,me dît,ku ji alî xwendevanan ve çiqas bi dilovanî hatine heskirin.Gelek xwendevan dihatin û ji me re digotin; Li kîjan gundî,li kîjan warî dengbêj û çîrokvan hene.Wan gelekî xizmet ji me re dikirin û em dibirine gunda da ku em binivsînin. Bi vî awayî me bi sedan şirîtê dengnivîsokê tije kirin û niha ew di mala me de têne xweyîkirinê. Niha gelek ji wan çîrokvanan û dengbêjan êdî tune ne,çûne ser heqiya xwe.Herwekî ji wan Hemzoyê Bedo,Cindiyê Têco, Gula Xido û h.w.d. Pirrek ji wana kal bûne, gava ku em rastî wan tên û dipirsin: ''Kalo tê bîra te li fîlan salê me ji te tiştekî wiha nivîsandiye'' Ew jî dibêjin:''Kurê min dibe ku min gotiye,lê nayê bîra min,kalbûn û pîrbûn mala meriya xeradike lawê min''.

Xebata me herdu biran kêmcîbû,tiştên ku zarbêj digotin me dixistine ser rûpelan,lê awazêd stranêd me yêd nazik û dilşewat dimane bê deng.Ji salêd 60-î destpêkirî xuşka me Cemîle jî gihişte me. Cemîlê,konservatorya para mûzîka cimetê kuta kir. Ji me re gengaz çêbûn,ku awazên kurdî jî bikevine nava pirtûkan. Dora 500 stran û awaz niha bi nota çapbûne.

**ARMANC: Di nava Kurdên Sovyatistanê de gelo hûn bi tenê vê xebatê dikin an hinekên din jî hene?**

C.CELÎL: Pirsa we gelek bicî ye.Ji serî de min tenê li ser xwe got.Ma gelo di nava Kurdên Sovyetistanê de ev xebat barê stûyê me tenê ye?

Helbet na.Di pêşgotina pirtûka zargotina Kurdên Suryê de min gotinek wiha nivîsiye:''Ji rêwî zanayêd Awrûpî yên ku nasiya xwe bi cimeta Kurdan re dane,ew hemû jî ji dewlemendî û rengînbûna zargotina Kurdî re ecêb mane''.Kurdnasên sedsaliya 19-a û 20-an hemûya jî xwe êşandine û nimûnên zargotinê li gorî karînên xwe nivîsandine.

Gava ku Şoreşa Oktoberê di nava welatê me de hilat,nihêrandina çanda gelêrî jî bi awakî ve destpêbû.Hukumeta Sovyetê alîkarî dikir,ku zargotin, etnografy, ziman û dîroka cimetan bi firehî bê kolandin û pêşvexistinê.Di vê meşê de, cimeta Kurdên Sovyetistanê jî bi par bûn.Kadirên miletê Kurd ên nûbişkivî dest bi xebata hêle(aktîf) kirin,da ku çand û toreya Kurdî jî pêşve here.Di vî warî de berhevkirina zargotina Kurda bû karekî berbiçav.Ji pêşewityên medeniyeta Kurdên Sovyetistanê;Ereb Şamîlov,Heciyê Cindî,Casimê Celîl,Emînê Evdal û yêd mayîn xizmeteke giran kirin,ku toreya Kurdî li gorî jiyana nû biserkeve.Di warê berhevkirina nimûnên zargotina Kurdî de zêde zêde divê em giranbuhayiya keda Heciyê Cindî,Emînê Evdal,û Kujikyan(Êermeniyekî Moksê bû,bi kurdî xweş dizanîbû) ji bîr nekin.Profesor Heciyê Cindî heta niha jî bi kel xwe amadeyî vê riyê kiriye.Kurdnasên Sovyetistanê Dr.Qanatê Kurdo,S.Rûdenko,Çerkez Bakayev,Î.Sûkêrman û êd mayin jî di vî warî de xebatnên hêja kirine.Helbet,ev hemû kirin li hemberî zengînbûna zargotina Kurdî tiştekî gelek hindik e.Pergala zargotinê bingehekî fire ye ji bona pêşdabirin û lêgerîna zimanzanî,dîrok,tore,fîlosofî(felsefî),sosyologî û etnografya gelê Kurd.Çewa em dibînin xebata berhevkirina zargotina Kurda,kurdnasên Sovyetî bi giranî di nava Kurdêd Sovyetistanê de kirine.

**ARMANC: Hûn xebata xwe bi tenê di nav Kurdên Sovyetistanê de an di nav hemû Kurdan de dikin?**

C.CELÎL: Di salên 50 û 60-an de gelek muhacirêd Ermenî ji Suryayê vegerîne welatê xwe Ermenîstanê.Ermeniyên ku ji Qamişliyê û Ji Kobaniyê vegeriyabûn ewana bi eslê xwe ve Ermeniyên Tirkiyayê bûn.Ji kal û bava de di nav Kurda de jiyane.Ziman,urf û edetêd Kurda baş zanîbûn.Heta hinek ji wana qet zimanê ermenî jî nizanîbûn,bi zimanê kurdî dipeyivîn.Di nav wan de çîrokvan û dengbêjên şuret jî hebûn.Ez,Ordîxan û Cemîla me berê xwe da wana jî û jê gelek tiştên giranbuha nivîsîn.Bi vî rengî me kanî nimûnên zargotina Kurdên Qamişliyê û ya welatê Bişêriyê(Kurdistana Tirkiyê) ji devê wan bigrin.

Sala 1982-an rê li ber min vebû,ku ez bêm nava Kurdên Suriyê li nava Kurdên Çiyayê Kurmanc,Qamişliyê,Amûdê û Dêrikê geriyam û gorî karîna xwe,min nêzîkî 1100 rûpelî nimûnên zargotinê nivîsîn û 143 şirîtên dengnivîsokê tije kirin. Min perçekî ji vê berhevkirina xwe kir pirtûkekê û di nêzîk de wê bighê xwendevanan.Parek ji vê berhevkirinê,qewl û beytên Êzîdiya ne,ên ku min ji nav Kurdên Êzîdiyên Çiyayê Kurmanc berhevkiriye û hîn ne di bin çapê de ne.Daxwaza min ew e,ku van gotinên kevnare û giranbûha tevî qewl û beytêd Kurdên Êzîdiyên Sovyetistanê,bi berhevokek cihê ve û bi lêkolîneke zanyarî di salêd nêzîk de raberî xwendevana bikim.

Niha jî ku dîsa ez mêvanê Kurdê Suryayê me,wek berê li nimûnên zargotina Kurda digerim û dicivînim.Bi daxawa(mixabin) wekî gelê Kurd dibêje,''Destê tenê deng jê nayê''.Ez di bahrê de bi zora xwe tenê kekûlek av dikarim hildim. Daxwaza min ew e,ku rewşenbîrêd Kurd hêz û tevgera xwe nehêwişînin û ji wê bahrê bi xwe jî avê hilgirin,da ku di roja dawiyê de nebêjin ''Ax û ax,em di nav bahrê de bûn lê tî man''.

**ARMANC: Li gor we ji bo lêgerîn û berhevkirina zargotina Kurdî çi divê?**

C.CELÎL: Pirsa we gelek girîng û bicî ye.Helbet şert hene.Ew kesê ku bixwaze di vî warî de bixebite,divê bizanibe ''Çi,çewa û ji kê binivîse''.Bersîva van pirsan em dikarin dûr û dirêj jî bêjin.Lê em bi kurtî li ser bisekinin.

Zargotin beş-beş e.Hene çîrok,mijûlî,çîvanok.Hene beyt û serpêhatiyêd êpîkî,wek ''Mem û Zîn'',''Ker û Kulik'',''Binevşa Narîn'',''Dewrêşê Evdî'', û êd mayîn.Hene sitranêd mêraniyê; Lawko Heyran,Cengleme û Rostemî.Hene mamik(Têdirxistînok),mesele û metelok,sitranêd dawetê û ên şînê(lawjok),êd xebatê;''Dankûtê,Dîbekê,Desthêrkê,paleyê'' û êd mayîn.Hene nifir û dua,xaşxan(dilok),zûgotînok,hevalok,xizêmok,payîzok û gelek rengêd dinê.

Berhevkirê zargotinê dikarê xwe amade ke yan beşekî ji vana berhevke,yan jî gund bi gund,herêm bi herêm li ser hîmê zaravayî ji hem beşa berhevke. Berhevkir d zargotinê dikarin ûsa jî zarbêjekî eslî û hunermend bibînin û ji zarê wî hemû çi ku zane binivsînin.Gava pirtûkekî hazir kirin dikarin tenê ser gotinên zarbêjekî bi nav bikin,an zargotina zaraavayeke taybetî,an jî beşekî zargotinê bi awakî pirtûkekê çapkin.Nivîsar daha giranbuha dibe gava berhevkirê zargotinê nimûna ji devê hunermendekî zargotinê dinivisîne.Heqê berhevkirê zargotinê tuneye guhertina di nava gotin û zimanê zarbêj de bike.

Zarbêj bi çi awayî,bi çi zaravî û bi çi zimanî,divê wilo jî bê nivîsadinê.Ev seba çiye?

Carna merî hene dibêjin:''Va gotina rast e,va gotina ne rast e'' Herkesî tirê zaravê wî rast e û ê dinê ne rast e.Nihêrînên hen ne rast in.Ji bona zanîna zimanê kurdî di herêmekê de pir girîng e pergala zaravî di nivîsaran de were parastinê,da ku zimanzan bikaribin li ser hîmê van nivîsaran zaravên kurdî vekolin.Gotinêd biyanî jî divê neyê çêkirin.Bi vî rengî zimanzan dikarin bidin nîşandan gelo li kîjan deverê,kîjan zara paqij maye û bîr û baweriyêd ehlê(şêniyê) wê deverê bi çi awayî hatiye guhastinê.

Rewşa zarê zarbêja û zimanê wan winda nabe,eger em gotinêd wan bixine dengnivîsokê.Gava ne dengnivîsok be çîrokvan dixwaze gotinêd xwe bi ''ciwanî'' raberî berhevkir bike.Îcar bi vî tonî peyvên kemkurî derdikevin.Helbet vê yekê em bi piranî ji bona nivîsandina çîrok û stranên êpîkî dibêjin.Eger berhevkir çîçkî dibîne,ku guhastin an şîrovekirina gotina pêwist e,gereke ji tekstê der,li jêr ser binivîse.Ji bona her nimûneke zargotinê re pasaport gerek e;ango,kê ev nimûn gotiye,kengê te nivîsandiye,ji kê derê te girtiyê û zarbêj bi xwe ji kê hînbûye.Li ser zarbêj gereke bi firehî were nivîsandin:Ji kîjan êlê ye,ji ku warguhêz bûye,xwenda ye an ne xwenda ye,emrê wî çiqa ye û h.w.d.

Tiştekî girîng jî heye,kêmaniyek mezin çêdibe gava yek,çîrokekê an çîvanokekê li ciyekî dibihîse tê mala xwe û li gorî zimanê xwe û zanîna xwe dide ser kaxezê.Meriyê xwenda nikare weke ê zarbêj hewal de(bêje).

**ARMANC: Piştî hevdîtina me ya berî vê, sê sal derbasbûne,di navbera van her sê salan de we li ser folklorê çi tiştên nû daye hev?**

C.CELÎL:Berî hatina min bo Suryayê sala 1982-an ez û birayê xwe Ordîxan,me pirtûkeka zargotina Kurda (cild 2) bi tîpên latînî xistibû bin çapê.Heta ku ez vegeriyam ew pirtûk hatibû weşandin.Ev pirtûk li ser beyt û sitranêd kurdî yên êpîkî bûn.Par me herdû biran bona zarokêd me yên dibistanê pirtûkek ji nimûnêd zargotina Kurdan ya bijare amade kir.Navê vê pirtûkê ''Gulançkzêrîn''e.Niha jî pirtûka ''Zargotina Kurdên Suryayîê'' çap dibe.Di vê berhevokê de min nimûnêd poêtîkî ên ku min li Suryayê sala 1982-an de berhevkiribû,bicî kiriye.

**ARMANC: Hilberiyên di destê we de yên neçapbûyî çi hene?**

C.CELÎL: 128 qewl û beytêd Kurdên Êzîdî min berhev



**Dr.Celîlê Celîl : ''... rewşenbîrêd Kurd hêz û tevgera xwe nehêwişînin û ji wê behrê bi xwe jî avê hilgirin, da ku di roja dawiyê de nebêjin 'ax û ax, em di nav behrê de bûn lê tî man.''**

*Dûmahîk r.7*